


## Sedsaliya Rojnamegeriya kurdî li gelê me pîroz bel

**E** Kurd, divê bi taybê li ser vî esasî bimeşîn û layiqê Miqdat Bedirxan, Celadet Bedirxan, Musa Anter û Mazlum Doğanê ku di bin zilma herî mezin de, li Zîndana Amedê rojnameyek derxistiye, bibin. Divê 1998'an bikin tac ji Miqdat Bedirxan re.

Rûpel 8-9



( پلاده روزانه جاری تیت قیامدن جریدهیا کردی به )  
 کرداری تحصیل علوم و کتونه تشویق ایدر تصایح و ادبیات کردی بی حاوی  
 ( لوان بیس کونده بر نشر اولتور کردجه خزنه در )  
**KURDISTAN**  
 Adresse : Rue de Carouge, n° 7, GENÈVE (Suisse)  
 خزنه کتسلکنه موالتی مریجه زیکه فارسیجه مکتوبه کردجه بهالترجه نشر اولتور

*Piştî 100 salî, stêrka te geştir dibe*

# 'Kurdistan'

**Nûçe**

Di bingeha kêşeya kurd de  
kêmbûna îradeya siyasî ...

R. 3

**Nirxandin:**

Mazot:

Dimsa nûjen


R. 4

**Bîranîn:**

Di helbest û stranên  
kurdî de Lenîn

R. 6



Azadiya **WELAT**

SAMI TAN

Bi taybetî gelê tirk ji kampanyayên bi vî rengî zerareke mezin dibîne. Medya tirk bi destê xwe hût û cinawiran diafirîne, her wekî "cinawirên trafik û enflasyonê", cinawirê mirovxur şovenîzm jî li ser gelên me dibe bela.

## Şerê bi navgînên ragihandinê û hûtê mirovxur

Li gorî belgeyên dîrokî di navbera destpêka rojnamegeriya tirkan û destpêka rojnamegeriya kurdan de 32 sal hene. Rojnameya yekemîn a tirkan Tercümanî Ehwal di sala 1866'an de, rojnameya yekemîn a kurdan Kurdistan jî di sala 1898'an de dest bi weşanê kiriye. Ji bo bûyerên dîrokî ew ne maweyeke dirêj e.

Dema em îro rewşa rojnamegeriya tirkan û ya kurdan bidin ber hev ferqeke mezin heye. Sedema vê yekê jî aliyê her kesî ve tê zanîn; gelê ku hebûna wî, çand û zimanê wî bê redkirin, xuya ye ku de di vî warî de jî li paş bimîne. Heke Pêngava Teverga Azadiyê nebûya, dê îro ew hejmar pir hindiktir bûya.

Röja îroyîn gel têkoşîna xwe digel çekan, heta ji çekan zêdetir bi riya navgînên ragihandinê dimeşînin. Lewre jî gelên ku di vî warî de xebatê nekin, heke di şerê leşkerî de bi ser bikevin jî, di şerê giştî de nikarin bi ser bikevin. Ji ber ku şer, şikêndina vîn û baweriya dijmin e. Ji bo vê yekê jî pêwîstî bi şerê derûnî heye.

Pratika çapemeniya tirk a hefteyekê ve rastiyê bi awayekî zelal nîşan dide. Gelê kurd di Newroza 1998'an de konseptê dewletê ya nû têk bir, kesên ku dixwestin tevgera kurd marjînal bikin, bi xwe marjînal bûn. Li ser vê yekê şerê psikolojîk di nava çapemeniya tirk de lez girt. Medya tirk çawa ku piştî serhildanên Newrozê, bûyera Şemdin Sakik derxist holê û bi hezaran senaryo afirandin. Piştî ku stratejiya nû ya artêşa tirk li hemberî gerla têk çû, îcar bi operasyonê derewîn, Sakik anî Tirkiyeyê. Ev yek jî di nava rûpelên rojnameyên tirk û di ekranên televîzyonên tirk de wekî serkeftineke mezin tê nîşandayîn. Kes napirse; "Gelo ew serkeftin li hemberî kê ye? Hêzên tirk ew kes ji ku revandine, jixwe ne di destê PDK'ê de bû? PDK jî ne hêz heye û ne jî daxwaz heye ku li hemberî we rabe, îradeya xwe bi temamî teslîmî we kiriye, îcar hûn qala operasyon û serkeftina çî dikin?"

Li vir armanc diyar e. Ew dixwazin bi riya şerê psikolojîk îradeya gelê me teslîm bigirin, vîn û baweriya wî bişkinin.

Lê medya kurd jî li hemberî vî şerê kirêt, bêdeng namîne, derewên medya tirk yek bi yek derdixe holê û teşîr dike. Ji ber vê yekê piraniya gelê kurd bi rastiyan dihesê û hewlên medya tirk di avê de diçin. Lê yê ku ji vî şerê kirêt zerarê dibînin, hinek kurdên ji derfetên bi destxistina agahiyên dîr û gelên din ên Anatoliyê ne. Bi taybetî gelê tirk ji kampanyayên bi vî rengî zerareke mezin dibîne. Medya tirk bi destê xwe hût û cinawiran diafirîne, her wekî "cinawirên trafik û enflasyonê", cinawirê mirovxur şovenîzm jî li ser gelên me dibe bela.

Dema mirov bala xwe bide çapemeniya navneteweyî jî, tê dîtin ku medya tirk çiqas ve bûyerê dinepixinê. Ajansên navneteweyî ev bûyer wekî kurteûçedan, jixwe heqê wê jî ev qas bû. Lê medya tirk li ser daxwaza rêveberiya şerê taybet, bûyerên biçûk dinepixinê û pê rojevê dagir dike. Pêwîst e gelên me guh nedin, vir û derewên şerê taybetî, ji bo gurkirina agirê şoreşa gelan, amadehiya pîrozkirina cejna karker û kedkaran; 1 gulanê bikin.

## Dayik peywira xwe dikin, lê em?

## HARBÎ SOYLU

## Ferahengok

**ajotkar:** ajo, şofêr  
**awêne:** neynik, lilik  
**bager:** firtuna  
**berz:** bilind  
**berzekirin:** windakirin  
**bêcirkirin:** zivêrkirin  
**bêhempa:** yekta (emsalsiz)  
**çarenûs:** qeder  
**çêlîkirin:** behskirin  
**darbest:** tabût  
**darêjtin:** afirandin, pêkanîn  
**demjimêr:** katjimêr, seat  
**dilok:** stranên govendê  
**duçerx:** bisiklet  
**erik:** rol, fonksiyon  
**gengeşî:** nîqaş, gotûbêj  
**gewre:** mezin  
**giyan:** ruh  
**hevdişî:** berberî, rikeberî  
**hetav:** roj, xor  
**hîro:** hatmî çiçeği  
**îstgeh:** radyo  
**kêl:** kevîrê ser goran; dirûn  
**lêre:** vir, vê derê  
**neft:** petrol  
**parzemîn:** qîta

**pasevan:** parêzkar  
**perpar:** pirpar (semi-zotu)  
**pêgeh:** war (kapsam)  
**pêrghatin:** lêrasthatin  
**pêxer:** pêşir  
**pinpinik:** perik, perperok  
**piçrast:** rehet, dilfireh  
**qelaç:** qeraj (kuraç)  
**reh:** kok  
**reşbîn:** karamsar  
**rex:** alî, hêl  
**rêptivan:** qaîde (kural)  
**rondik:** firmêsk, hêstir  
**salroj:** roja ji dayikbûnê  
**selmandin:** îspatkirin  
**sermîştîvûn:** serberjêrbûn  
**sîrûd:** marş  
**sîber:** sî  
**şanazî:** gurur, onur  
**şane:** nokta; hücre  
**tekûz:** bêtêmasî, temam  
**tolazî:** qerfokî, henekî  
**tinazî:** gihayek  
**vegubezîn:** neqlkirin  
**xilmaşî:** xewokî  
**xweçengkirin:** xweçekirin  
**zurbe:** keriyê guran

Dayik di civakê de cihê herî mezin û birûmet digire. Dayik sedema hebûnê ye. Her heyberek xwedî dayikê ye. Dayika hemû heyberan jî ax e. Ji ber ku ax, her tim dizê, di nav sing û berê xwe de heyberan dihewîne.

Dayik jî mîna axê ye. Zarokan diwelidîne, xwedî dike, mezin dike. Ji axavtinê bigire, hetanî birêveçûyîna, ji exlaq, edeb bigire heta rabûn û rûniştinê hemû gewşînan di biçûkayî de dayik hînî zarokên xwe dike. Dayik xwe ji zarokên xwe re dike star. Di zor û zehmetiyan de ji wan re dibe alîkar. Dayik sedema jiyana ye. Her wekî ku tê gotin; "jin jiyana ye." Ev gotin bêhtir ji bo dayikan tê gotin. Lewre dayik jiyana diafirîne. Bêşik keda hemû dayikan li ser zarokên wan pir e. Pêwîst e ku mirov girêdaneke rast, têkiliyeke rast bi dayikan re çêbike, ku karibe ji bin maf û keda wê derkeve. Bi rastî jî em deyndarên dayikên xwe ne; pêwîst e ku em deynê wan bidin. Dema ku em mafên dayikan binpê bikin, em nikarin bibêjin em zarokên qenc û baş in. Ger ku mirov bibêje "ez zarokî/e baş im, ji dayika xwe re bikêrhatî me", pêwîst e mirov ji bo yekîtiya dayikan çalakiyan çêbike. Dibe ku pirsêke wiha bê pirsîn: "Ma qey dayik nikarin yekîtiya xwe çêkin?" Helbet dikarin. Lê belê, hêz û alîkarî lazim e. Dema em wan perwerde bikin, ew dê bêhtir bikaribin bimeşin. Tê zanîn ku dayik di

warê bîrdoz, ramyarî, rêxistinî û hwd. de gelekî lawaz in. Heta dawiyê fedakar in, dilsoz in, lê belê zanebûna wan kêm e. Pêwîst e ku dayik bibin xwedî vîneke azad, xwedî vîneke şoreşger. Dema ku vîn azad be, wê demê zîlam jî nikarin serdestiyê li wan bikin. Ev tenê jî ne bes e. Dayik gelek tiştan dixwazin. Dayik dixwazin azad bibin. Lê belê, heta dayika mezin azad nebe, ew jî azad nabin. Lewre di welatekî azad de dayik jî azad

**Dayik di serhildanan de li pêş in, di rojiyên birçîbûnê de li pêş in. Bi kurtasî li hemû deverên têkoşînê dayik hene. Dayik peywira xwe dikin, lê em?**

in. Berî ku Têkoşîna Rizgariya Nete-weyiya Kurdistanê dest pê bike, xwestekên dayikan gelekî biçûk bûn. Dayikê jî zarokên xwe çî dixwest? Digot: "Kurê min, min tu xwedî kirî, mezin kir, vêca tu bixebite, min jî xwedî bike." An jî hinek dayikan digot: "Kurê min te qet bi keda xwe ji min re tiştê nekiriye. Ka ji min re fîstanekî an kirasekî bikire." Ev xwestekên dayikan, xwestekên kesane bûn. Çawa me li jor da xuyakirin, dayik di warê bîrdozî û ramyarî de gelekî lawaz in. Dema ku civak bi bîrdozî û ramyarî be, mirov dê li ser çî bifikirin?

Lewre civakên wiha binketî ne. Jiyan di tixûbê koletiyê de didome. Berjewendiyên şexsî li pêşiya berjewendiyên neteweyî ne.

Rewşa civaka Kurdistanê jî berî çend salan wiha bû. Lê îro ji bo rizgariya welêt, dayik bi dilxwazî keç û lawên xwe dişînin nav refên şoreşê. Bi rastî jî ew xwestekeke gelekî mezin e, barekî gelekî giran e. Lê belê bi rûmet e. Ew dayikên ku berî bîst salan zarokên xwe dişandin leşkeriya dijmin, kur û keçên xwe bi dilan, bi tili dişînin nav refên artêşa xwe, dema ku zarokên wan şehîd bikevin jî, destên wan hene dikin; li ser wan dilan digirin û dilîlînin. Dayik di serhildanan de li pêş in, di rojiyên birçîbûnê de li pêş in. Bi kurtasî li hemû deverên têkoşînê dayik hene. Dayik peywira xwe dikin lê em? Em çiqas bersiva mafên dayikan didin. Serokê Neteweyî di vî warî de wiha dibêje: "Ber-sivdayina mafên dayikan tiştê herî mezin, bi şervantiyeke serkeftî û demdirêj gengaz e." Ji gotina Serok jî tê fêmkirin, dayik şer dixwazin. Lewre dizanin ku bêşer, aştîyeke birûmet ne gengaz e. Şer çiqas bi pêş bikeve, dayika mezin Welat jî ew qas zû azad dibe. Ji ber vê yekê jî xwesteka dayikan şer e.

Di dawiyê de mirov dikare wiha bibêje; em ji bo xelasiya dayikan, ji bo azadiya dayikan şer bikin. Azadiya dayikan, azadiya gel e, xelasiya dayikan xelasiya Welat e. Welat Kurdistan e, Kurdistan jî dayik e. Dayik jî rûmeta me ye.



Rapora Baroya Amedê li ser kêşeya kurd:

# Di bingeha kêşeya kurd de kêmûna îradeya siyasî heye

Baroya Amedê li ser kêşeya kurd raporek amade kiriye. Di vê rapora ku hefteya çûyî hatiye daxuyandin de, li ser rewşa bakurê Kurdistanê tesbît û agahiyên balkêş hene. Di pêşka raporê de tê gotin ku, li herêmê rewşeke trajîk heye û di bingeha vê yekê de jî çareser nekirina kêşeya kurd heye. Her wiha tê diyarkirin ku, li cihê çareseriyê, perçiqandina van serhildanan bûye politîkaya dewletê ya sereke. Dîsa di rapora navborî de tê daxuyandin ku, ji ber vê helwesta dewletê, demokrasî û prensîbên hiqûqê bi cih nabin, ji destpêka komara heta niha li herêmê hiqûqeke taybet heye.

Di raporê de tê bibîrxistin ku, ji ber şerê ku 14 sal in didome, 30 hezar kesî jiyana xwe ji dest daye, sê hezar gund bi darê zorê hatine valakirin, 3 milyon kes hatiye koçberkirin, bi sedhezar dekar dar û ber hatiye şewitandin. Di nava raporê de ev gotin balê dikişînin: "Erdnîgariya ku em lê dijîn, gelek êrîş û dagirkerî dîtine, lê zilma niha ji êrîşên moxolan bi vir de nehatiye dîtine. Ji bo ku dawî li van bûyerên bê, divê kêşeya kurd bê çareserkirin. Ji bo vê yekê jî pêdivî derdorekî cur bi cur; berî her tişti jî pêwîstî bi îradeya siyasî ya biryardar heye. Lewre di bingeha kêşeyê de kêmûna îradeya siyasî heye."

Piştî van tesbîtan, li ser rewşa mafên hiqûqa navneteweyî dide kurdan tê rawestandin. Di raporê de hincetên ku rayedarên tirk ên li hemberî raya giştî ya navneteweyî ji bo nepejirandina mafên kurdan jî, bi van gotinan tê bersivandin: "Rayedarên Tirkiye diyar dikin ku, li gorî Peymana Lozanê kurd ne hindikahî ne, lewre jî ev peyman tu mafî nade kurdan, lê ev gotin ne di cih de ne. Lewre ew peyman, piştî Peymana Lozanê hatine îmzekirin û li gorî benda 90'î ya Zagona Bingehîn hukmê wan peymanan bi qasî hukmê zagonên hiqûqa hundirîn serdest in. Li aliyê din kurd jixwe ne hindikahî ne, lewre ew li herêma ku lê dijîn piranî ne."

Di raporê de zagonên ku rê li ser geşedana nasnava (kimlik) kurdî digirin, wiha hatine rêzkirin.

1) Benda 16'an a Zagona Nifûsê û bendên 5 û 7'an ên Giştînameya Paşnavan, nahêle ku ew navên bi kurdî li zarokên xwe bikin.

2) Ji ber Zagona Rêveberiya Bajaran, benda 1/2'yan, kurd nikarin navên kurdî bidin cihê ku ew lê dijîn

3) Qedexa ye ku kurd ramanên xwe bi kurdî vebêjin. Her çiqas di pratîkê de hinekî nermî hebe jî, bendên 4, 26 û 28'an ên Zagona Bingehîn vê yekê difermanin.

4) Benda 42'yan a Zagona Bingehîn û Zagona Perwerdehiya bi Zimanê Biyanî rê nadin ku perwerdehi bi kurdî pêk were û sazîyên perwerdehiya bi kurdî bîn vekir.



rin.

5) Li gorî bendên 28 û 30 ên Zagona Bingehîn û benda 32/1 a Zagona Çapemeniyê weşana bi kurdî qedexa ye.

6) Kesê ku komeleyekê li ser navê kurdî dayetiye veke, li gorî benda 8'an a Zagona Têkoşîna bi Terorê re tê cezakerin.

7) Bi kurdî pêkanîna çalakiyên hunerî bi Zagona Berhemên Sinema, Video û Muzîkê, bendên 5 û 9/3'yan hatiye qedexekirin.

8) Riya vekirina radyo û televîzyonên bi kurdî li gorî bendên 4/a, 5/a, 5/f ya Zagona Radyo û Televîzyonan hatiye astengkirin.

Erdnîgariya ku em lê dijîn gelek êrîş û dagirkerî dîtine, lê zilma niha ji êrîşên moxolan bi vir de nehatiye dîtine. Ji bo ku dawî li van bûyerên ku xesara ku ew dide mirov û erdnîgariyê bê, divê kêşeya kurd bê çareserkirin. Ji bo vê yekê jî berî her tişti jî pêwîstî bi îradeya siyasî ya biryardar heye.

rin.

9) Bi mebesta pêşvebirina çanda kurdî, vekirina komeleyan li dûv daxwaza Zagona Komeleyan, bendên 5 û 6'an berbenkîrî ye.

10) Li ser navê kurdî dayetiye vekirina partiyên siyasî, yan jî di yê heyî de piştewaniya doza hebûna kurdan bi benda 68'an a Zagona Bingehîn û bendên 5 û 81'an ên Zagona Partiyên Siyasî qedexa ye.

Di dawîya van xalan de, li ser girtin, îşkenceyên di binçav de, şewitandina gund û daristanan, koçberkirina mirovan, faîlî meçhûlan, sistema cerdevaniyê, helwesta DGM'yan û rewşa girtîgehan tê rawestandin. Bo nimûne tê peyitandin ku sistema

cerdevaniyê komeke berxurê (rantiyer) şer afirandiye. Cerdevan tevî hêzên dewletê di karên kirêt de cih digirin, faîlî meçhûl û windakirin bi destê hêzên dewletê pêk tên, îşkence bûye rêbazêke pirsyarkirinê, DGM ne serbixwe ne û hwd. Di raporê de tê diyarkirin ku, 6 parêzer jî di nav de heta 3 hezar kes bi faîlî meçhûlan hatine kuştin, 46 parêzer jî di nav de zêdetirî 100 hezar kes di navbera salên 1984-1997'an de li dadgeha hatine dari-zandin, li girtîgehan tevkujiyên mezin pêk hatine, bi hezaran kes hatine windakirin.

Li dûv van ravekirinan di encama raporê de ji bo ku rê li ber çareseriyê kêşeya kurd vebe, ev daxwaz hatine rêzkirin.

1) Divê bandora şidetê ji holê rabe, aliyên şer dev ji helwesta têkbirina hêza li dijî xwe berdin û li ser seranserî wela-tê me mercên aştiyê pêk werin.

2) Zagona Bingehîn jî di nav de, divê hemû zagon û biryarên ku hebûna kurdan înkâr dikin, ji holê bîn hilanîn, Hebûna kurdan bê misogerkirin (garantî).

3) Divê tavilê dawî li rêveberiya ne-asayî bê, sistema cerdevaniyê bê hilanîn.

4) Zagona Poşmaniyê divê yekser ji navê rabe.

5) Pêwîst e kesên koçber di mercên ewlehî de karibin vegehin cih û warê xwe, zîrar û ziyana wan ji aliyê dewletê ve bê tazmînkirin.

6) Divê dawî li înfaz û kuştinên kiryar veşartî bê, berpîrsên van kirina bîn dari-zandin.

7) Hewce ye, hemû astengên li ber derbirina ramanan ji holê rabin.

8) Pêwîst e mebusên kurd serbest bîn berdan.

9) Divê efûyêke giştî bê daxuyandin.

NAVENDA NÛÇEYAN

## Kurtenûçe

Nivîsgeha Çapemeniyê ya Navenda Giştî ya HADEP'ê û Serokê şaxa HADEP'ê yê Enqereyê Kemal Bülbül, bi daxuyaniyan pest û kotekiyên dewletê yê li ser HADEP'ê şermazar kirin. Di daxuyaniya bo çapemeniyê de qal kongreya Bismilê tê kirin û tê gotin ku di dema kongreyê de avahiya HADEP'ê bûye hedefa êrîşan û di encamê de Serokê şaxê Bismilê Abdullah Şehmuzoğlu jî di nav de, 75 endam û rayedarên wan bi cop û qalasan hatine binçavkirin.

Wekî tê zanîn der heqê Serokê Daîreya Istixbarata Emniyeta Tirk ê berê Hanefî Avcî de, bi hinceta ku telefonên MİT'ê eşkere kiriye, bêtî ku ji 15 sal ne kêm be doz hatibû vekirin. Danişîna yekem a vê dozê roja 15'ê avrêlê li DGM'ya Enqereyê pêk hat. Avcî li dadgehê ragihand ku, ji ber ku wî behsa bûyerên di Rapora Susurlukê de kiriye, dixwazin dengê wî bibirin. Her wiha Hanefî Avcî der barê Yeşil de jî got ku, madem hew çend suc kiriye gelo çima dewlet wî nagire?

Komeleya Rojnamevanên Tirkiyeyê (TGC) rapora xwe ya meha adarê weşand. Li gorî vê raporê, meha borî piraniya wan çepgir 10 buroyên kovar û rojnameyan ji hêla hêzên dewletê ve hatine dagirkirin. Her wiha di he-man mehê de, 19 rojnamevan hatine binçavkirin, 14 rojnamevan di şopandina çalakiyan de bûne hedefên êrîşên polîsan, 10 kovar û rojname hatine desteserkirin, weşana 4'an hatiye berbenkîrîn û der heqê du pirtûkan de jî biryara berhevkerinê hatiye dayin.

Rêxistina Istixbaratê ya Tirkiyeyê MİT'ê, bi daxuyaniyêke bo çapemeniyê bal kişand ser rewşa Mahîr Kaynak û ragihand ku dîtine û ramanên Kaynak ji yê rêxistina MİT'ê cuda ne û ew tu car wan gotinan napejirînin. Di daxuyaniyê de wisa tê gotin: "Mahîr Kaynak ji sala 1980'î û vir de ji MİT'ê veqetiyaye lewre tu têkilî di navbera daxuyaniyên wî û MİT'ê de nîn e. Em gotinên Kaynak ku heta îro di çapemeniyê de pêşkêş kiriye, wekî dîtinên wî yê şexsî bi nav dikin."



*“Ez dikarim a niha bi mazotê serê xwe bişom.”*

# Mazot: Dimsa nûjen

Belê mazot êdî wekî nan û avê tê naskirin li vê herêmê. Xelk wekî bêhna gulana ji bêhna mazotê hez dike.

Wekî ajotkarekî kamyonekê digot: “Ez dikarim a niha bi mazotê serê xwe bişom.”

Dema radihêjin koda mazotê û bera tenekeyan didin, dibêjin:

“Ox çiqas xweş e!”  
Êdî tama mazotê wekî tama dimsê ye li vê deverê!



Ji sala 1990'î û vir ve li ser kamyonan gengeşiyê mezin di nava kurdên bakurî de heye. Bi taybetî gelê derdora Mêrdînê û Şîrnexê bi kamyonan radibin, bi kamyonan rûdin. Piştî Şerê Kendavê bi ambargoya NY'ê (Neteweyên Yekbûyî) ya li ser Iraqê, rayedarên Iraqê li derfetên bidizî yên firotina neftê geriyên û yek ji van riyên jî Deriyê Xêbûrê (Îbrahîm Xelîl) bû.

## Kamyon wekî kevir û kuçan in

Gelê Bakur bi salan e ku di vê riyê de neft û mazotê dikişîne û difiroşe. Lê bi rezîlyê mezin. Wekî jiyana kurdan a di her warî de, di vî warî de jî zehmetiyê pir mezin tê kişandin. Ew rasterast nikarin bo kirîna neftê (mazot) derbasî Başûr bibin, ji ber ku li gorî biryara NY'ê tenê destûra veguheztina xwarinê heye. Ji ber vê yekê di serî de xwediyê kamyonan, ji Tirkiyeyê arvan, kartol, pîvaz û hwd. bar dikirin û li ve gerê depoyê xwe tenê tijî mazot dikirin û dianî li herêmê difirotin. Lê dema arvan dibirin jî, xwediyê kargehên (fabriqê) arvanan, arvanê xwe ê herî nebaş bo Başûr dişandin û pîvazên xerabûyî bi mazotê diguherandin an difirotin. Piraniya arvanê ku dibirin jî toza gemarî bû.

Wekî ajotkaran bahs dikir, ew arvan pirê caran di nav sînorên Başûr de dihatê şewitandin. Carinan jî ji bêgaviyê kurdên Başûr ev arvan jî dixwestin.

Mazota ku dihat anîn, di serî de 3 ton bû, peyre gihîştê 4 û 6 tonan.

Ji ber bêkariyê li Kurdistanê piraniya gel bi taybetî gundiyan vê herêmê, zevî, rez û xaniyên xwe firotin û pê kamyon kirin. Ev yek bo wan jî bêkariyê çêtir bû, çiqas zehmetî hebû jî. Pirê caran kamyonajo bi mehan nedihatîn mala xwe û li ser rê an li ber deriyê gumrikê diketin rêzê. Li gelek astengî û pêkûtiyan rast dihatin. Heta ku mazota xwe dianîn û difirotin, bi qasî niv berdêla wê, bertîl (ruşwet) didan pêşmerge, polis, karmend û leşkerên devê deriyê gumrikê. Heta polisên trafikê jî paraxwe distandin.

Piştî gelek guherînan ev gengêşî hê jî didome. Piştî demekê jî mazot bû perçeyek ji jiyana mirovên vê herêmê. Kesên bêkar û xwedî kar gişan hemû hêza xwe daye ser rîya neftê ya Başûr. Êdî kamyon wisa pir bûne ku li kolanên navçeyên wekî Qoserê, Nisêbinê, Wêranşar, Cizîrê, Girê Amo (Sîlopî) û Mêrdînê wekî kevir û kuçikan in. Kamyonên ku temenê (emrê) wan 30 sal e jî bi milyaran nayên kirin.

Geh dewleta tirk derî girt û geh şeravanên azadiyê. Carinan jî ji ber şerê Başûr ê navxweyî, rê hate girtin. Lê her ku behsa girtinê dibê teperep jî dilê sedhezaran tê. Lewre rîya aboriya herêmê ya herî bi kêr ev e. Xwediyê kargehan, hesinkar, dikandar, şagirt û mişagirtên tamîrê giş bi vê riyê re têkildar in. Yê ku nikarin kamyonan bikirin jî, sed heb

qerekê bi heriyê li ser hev datînin û tenekeyekî li ber datînin. Dû re bi nivîseke çepel dibêjin “Ev der cihê firotina Mazotê ye.” Niha dema ku mirov li Qoserê, bi taybetî li rexa Riya Hevrêşimê bi rê de dihere, mirov dibêje qey neft di erda Qoserê de derdikeve. Li ser her gavê dikanek biçûk heye û mirovek li ber mazotê difiroşe. Carinan dibê hawara dayikên xwedî gelek zarok û dibêjin: “Hawarê rê bê girtin wê zarok ji birçînan bimirin”. Tiştêkî din jî xuya dibê ku, gelê kurd wekî şerê azadiyê, bi gelek astengiyan re dikare şer bike û hîni têkoşîna jiyane bûne. Bandora şerê azadiyê li vir jî xwe dide der.

Ji ber ku mazot pir e, bihayê wê jî, ji ya fermî erzantir e. Êdî xwediyê îstasyonên benzînê jî ji vê mazotê dikirin û difiroşin. Heta îstasyonên wekî İzmirê, Bursayê, Konya û Mêrsînê jî ji vê derê sûtê werdigirin.

## Waliyê Neftfiroş: Kamil Acun

Di vê pêvajoyê de her ku çû dirav (pere) hê pir hate holê û ranta neftê roleke mezin bi cih anî. Devê gelek mirovên kurd bi diravan hate tijîkirin û bi van pereyan gelek kirînan tarî pêk hatin. Mirovên dewlemend bi dehan kamyon xistin vê riyê. Êdî pirê dewlemendan bi diravan dilîzin. Di dema waliyê Şîrnexê Kamîl Acun de behsa 200 kamyonên çeteyan dikirin, li aliyekî din jî kamyonên serbaz, polis û karmendên

din. Ji bo kamyonan dibêjin “kamyonên taybet”. Ji ber ku biryara çûn û hatina van kamyonan di destê walî de ye, kamyonên taybet jî yê din bêhtir diçin û tên. Kamyonên taybet mehê sê çar caran diherin yê din jî mehê carekê bi zore diçin.

Di vê pêvajoyê de gelek dek û dolab hatin lidarxistin. Wekî par biryarek derxistin û gotin divê kamyon depoyên naylonî hilgirin. Dihat gotin ku walî bi xwe şîrikê kargeha naylonê ye. Bi dehezaran kamyon ji bêgavî depoyê naylonî ye. Bi deh hezaran kamyon ajoyan ji bêgaviyê, her yek bi 120 milyonî depoyên naylonî hilgirtin.

Êdî mirov xweş pê dihesê ku kuliya Kamil Acun ku li Şîrnexê hatiye çêkirin û her wekî gelek avahî û tiştên ku kaniya wan nediyar e, çawa çêbûne.

A niha dek û dolabeke din tê lidarxistin. Kamyonên ku plaqaya wan a Şîrnexê be, mehê du caran diherin û yê din mehê carekê. Ev yek jî dijberî û nakokiyê dixê nava kurdên herêmê.

Belê mazot êdî wekî nan û avê tê naskirin li vê herêmê. Wekî bêhna gulana ji bêhna mazotê hez dikin. Wekî ajotkarekî kamyonekê digot: “Ez dikarim a niha bi mazotê serê xwe bişom.” Dema radihêjin koda mazotê û bera tenekeyan didin, dibêjin “ooox çiqas xweş e” Edî tama mazotê wekî tama dimsê ye li vê deverê!



# Rêzimanê kurmançî

SAMÎ BERBANG

- Wane 7 -

Ji aliyê teşeyê ve navdêr, ji hev cuda dibin, hinek ji wan, xwerû hinek pêkhatî û hinek jî hevedudanî ne. Her wekî di mijara cureyên peyvên de hate gotin, navdêrên xwerû jî, ji hev nabin, yên pêkhatî bi alîkariya paşgir û pêşgirên pêk hatine, yên hevedudanî jî bi alîkariya du birên hevokê digihêjin hev, navdêrêkê pêk tînin.

**Navdêrên xwerû:** Aş, nav, meh, roj, kes, temen, tav, tas, kum, ker, şev...

**Navdêrên pêkhatî:** Aşvan, mehanî, navber, kesayetî, nanxur, kervan, şevger, rojî, tevger...

**Navdêrên hevedudanî:** Avaşin, rojname, keskesor, heftreng, keybanû, dotmam, birajin, pisxaltî, jintî, marmasî, dûvpişik, kerguh... Ji aliyê zayendê ve navdêr:

## Zayendên navdêran

Di vî zaravayê kurdî de zayenda navdêran bi du şeweyan diyar dibe. Yek hinek navdêr di binyata xwe de nêr an jî mê ne, hinek jî kurmançan ew wekî nêr û mê nimandine.

Mirov dikare van mînakên bide navdêrên ku dikevin nav bira yekemîn: Keç/kur, jin/mêr, hesp/mehîn, xwişk/bira, ap/ met, bav/ dê, xal/ xaltî, dîk/mirîşk, bûra/diş, bûk/zava, xezûr/xesû, beran/ mih, nêrî/ bizin, ga/çêlek

Hinek navdêr jî hene bi xwe nê-

tar(nötr) in, lê zayenda wan bi alîkariya hin peyv û qertafan diyar dibe. Mirov dikare bi alîkariya peyvên "nêr" û "mê" zayenda wan diyar bike,

wekî hirçê nêr/ hirça mê, kewê nêr/ kewa mê, pisingê nêr/ pisinga mê...

Her wiha hinek peyv û pêrkîten ku bi mebesta diyarkirina zayendê tînin bi karanîna hene. Wekî "dêl, mak, man, mê, nêr, pis, dot" Bo nimûne: Dêlegur, nêrekew, makew, mange, maker, pismam, dotman, jinbira, jinap

Cureyê duyemîn ê navdêran di binyata xwe de ne xwediyê tu zayendê ne, lê kurmançan ew wekî nêr an jî mê diyar kirine. Lewre jî hinek zimançan wê wekî zayenda derewîn jî bi nav dikin. Zayenda van navdêran bi riya tewang û veqetandekan tê nasîn. Mirov dikare çend mînakên ku zayenda wan bi riya veqetandekan diyar dibe, bide:

Hevalê min/ hevala me, biraziya te/ biraziyê wan, mirova baş/ mirovê baş, textê zêrîn, kevirê giran,, ramana wî, doza welêt...

Navdêrên li gorî zayenda xwe tînin te-wandin. Wekî mînak: Zinê got, wê xwarinê bîne, kulîkêkê bide wî, kevirêkê bavêje wan, vî darî bişikîne, vê malê ava bike, xaniyekî veke, vî nanî bixwe...

Li ser navdêrên di binyata xwe de ne

xwediyê zayendekê ne, rêz û rêçîkek tune ye, zayenda wan tê jiberkirin. Di bê gotin ku li ser zayenda di hinek peyvên de dubendî jî heye, li hin herêman peyvek mê ye, li yeke din nêr e. Bo nimûne, peyvên por, erd, tişt, wext, hefte, rih û hwd. li hin herêman wekî mê, li hinekên din jî wekî nêr tînin bi karanîna.

Ji ber ku rêpîvanek tune, hinek zimançanê kurd listeya tiştên nêr û mê didin, her wiha di ferheng û pirtûkên perwerdehiyê de digel cureyê peyvê, zayenda wê jî tê nivîsîn.

## Navdêrên nêr

1) Hemû hevenav û sernavên giyane-werên nêr. Mînak: Azad, bav, xal, bira, ap, Hesên, pisman, xezûr, zava, Gurgîn...

2) Hejmara yek ne tê de hemû hejmar-nav. Mînak: du, çar, şeş, sed, pêncî...

3) Navên rengan dema wekî navdêr bînanî. Mînak: zer, sor, kesk, şîn...

4) Hirî, liva, hêk, lorîk, toraq ne tê de, hemû berên ku ji sewalan bi dest dikevin.

Wekî: Goşt, çerm, kavil, dohn, dûv, mû, hingiv, şîr, mast, dew, firo, to, rûn,

5) Cîwa ne tê de hemû navên metalan Mînak: Zêr, zîv, hesin, sifir, pola

6) Şemamok ne tê de hemû berên bîstên. Mînak: Zebeş, petêx, , qitî, kundir...

## Navdêrên mê

1) Hemû hevenav û sernavên giyane-

werên mê, mîna; Zin, Zelal, xwişk, xesû, dê, bûk, diş, dotmam, dotmîr...

2) Kon, xanî, axur ne tê de hemû cih û wargeh, wekî: jûr, qonax, hêwan, kargeh, hewş, dêr, mizgeft, nivîsgeh, gom...

3) Makîneyên ragihandinê

Wekî: erebe, balafir, firoke, kelek, keştî, kamyon, otobus, duçerxe...

4) Ezman û ewr ne tê de hemû heyberên fezayî û qewmînen atmosferî.

Mîna: heyv, stêrk, zîpîk, xusî, pûk, babelîsk, bahoz...

5) Garis, genim, ceh, tîrî ne tê de hemû celebên beqleyan û navê fekî û sewziyên

Wekî: hinar, sêv, biyok, guhîj, xox, mêwîj, pîvaz, tivir, kartol, bacan, firengî

6) Sernavên cografîk, waekî: Ewropa, Kurdistan, Amed, Dêrsim, Rûsya...

7) Gund, bajar, welat, erd, çiya, zozan, çem, delav, gir, zinar, kendal ne tê de hemû navên cografîk, wekî mînak: bîr, gol, tengav, kendav, newal, parzemîn, cihuk, kanî, hevraz, herêm, dever

8) Amûrên muzîk û bûroyê, mîna: def, dahol, bîlûr, mase, kursî, daktilo

9) Lêkerên dema wekî navdêr tînin bikaranîna: Hatina min, çûna, xwarina baş

10) Navê roj, meh û salan, danên rojê Mînak: duşemî, avrêl, roj, hefte, meh, berbang, navroj, şev, êvar

Wekî nişe (têbînî) mirov dikare bibêje ku ev liste ne tekûz e, dibe ku hinek awarteyên (istisna) ku di vî listeyê de cih negirtin hebin, ev liste bi tenê ji bo ku fikr û ramanê bide hatiyê dayin. Mirov nikare vî listeyê wekî rênîşandêreke tekûz bibîne.

## Salvegera PKDW'ê

NEJDET BULDAN



Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welatê kete sê saliya xwe. Ji bo saziyeke neteweyî sê sal girîng in. Ji bo saziyeke di nav şer de sê sal gelekî girîng in. Ji bo gelên Kurdistanê, dostên Kurdistanîyan û her wiha dijminên Kurdistanê sê salên dijwar bofîn. Di qada şer de dijwarî. Di warê diplomasiyê de, di sazibûna têkoşinê de û li derveyî welat dijwarî.

Saziyeke ku nûnertiya gelê xwe bike bo Kurdistanîyan pêwîst bû. Têkoşina gelê Kurdistanê hatibû wê qonax û menzîlê. Dawiya sala 1994'an hindek rêxistin û hêzên neteweyî pêwîstiya saziyeke bi vî rengî dîtin. Van hêzan dest bi xebatê kirin û ligel Kurdistanîyên li derveyî welat hevdtin çêkirin. Nivîskarê vî nivîsê jî di nava Komîta Amadekar de bû. Komîteyê, bi berpirsariyeke gelek mezîn xebata xwe meşand. Ne bi tenê ligel rêxistin û partiyên kurdan hevdtin hatin pêkanîn her wiha ligel saziyên navnetewî, parlamentoyên welatên cur bi cur û gelek kesên bi nav û deng têkilî hate danîn. Bi giştî di hevdtinên Komîteya Amadekar de, raman

û encam yek bû.

Biyaniyan an jî rayedarên navneteweyî bo me digotin:

"Belê pêwîst e saziyek bo nûnertiya bête damezirandin."

Gotûbêj di nava Kurdistanîyên koçber de jî hatine kirin. Li hemû cihên ku gelê me lê dijiya, civînên mezin çêbûn. Bi hezaran mirov beşdarî van civînan bûn û daxwaziyên xwe anîn zimên. Ligel her civînê şahiyek jî li dar diket.

Partî û rêxistinên bakurê Kurdistanê, pêşniyara me qebul nekirin. Hindek ji wan bi nivîskî bersiva me dan û gotin em di nav saziyeke wisa de cih nagirin. Hindek ji wan jî sê sal e ku bersiva me nedane. Ew ên ku bersiv dane û lê di nava PKDW'ê cih negirtin jî, bawer nedikirin ku ev saziyê vî xebatê biket û li ser lingên xwe biminî.

12 Nîsana 1995'an bi çöseke mezin, bi beşdariya gelek kesên bi nav û deng û balkêşiya raya giştî PKDW hate damezirandin. Û dest bi xebata xwe kir. Her civîneke PKDW li pêrgî astengiyên dewleta tirk hat û bû sedema aloziyan. Ji Rusya heya Amerîkayê, ji Îrlanda heya Afrika Başûr hevdtin û xebatên xwe meşand. Bi parlamentoyên gelek herêm û welatan re têkiliyên dostanî danîn. Di nava gelên Kurdistanî de piştigiriya xwe xurt kir. Li derveyî welatê û Başûrê Kurdistanê, bi xebatên xwe yên bo aştî û azadiyê di dîrokê de cihê xwe girt. Di nava saziyên navneteweyî de li ser dewleta tirk, bû sedema biryarên girîng. Xebata xwe di du

warên pêwîst de meşandin. Yekemîn ji bo çareserkirineke siyasî bo pîrsa Kurdistanê. Duyemîn, pêkanîna yekîtiya Kurdistanîyan. Yanî Kongreya Neteweyî. Hem di warê diplomasiyê de û hem jî di warê çekirina yekîtiya Kurdistanê de li dijî hemû asteng û aloziyan xebat kir. Her wiha li dijî gelek astengên mezin yên hindek rêxistinên kurd jî hewl da xwe.

Li dijî PKDW'ê du dewletên nav û deng daxuyaniyên fermî belavkirin. Amerîka û dewleta tirk. Ew dijiya herdu dewletan jî li me xerîb nehat. Lê belê mixabin partiyeye kurd jî bi eşkerayî û veşartî li dijî PKDW'ê xebat kir.

PKDW'ê ji ber dagirkirina başûrê Kurdistanê hin hedefên dabûn pêşiya xwe bi cih neanîn. Niha hewl dide xwe ku ku hilbijartineke nû pêkbinî. Yanî xwe ji nû ve saz diket. Ji sala 1996'an vir ve heyetekê Parlamentoyê li Başûrê Kurdistanê ye. Parastina mafên kurdên koçber jî di nava xebatên PKDW'ê bûn. Wekî Etruş, Ninova û Îtalya. Gelek hevdtin ligel berpirsaryên Neteweyên Yekbûyî hatine çêkirin.

Belê, PKDW dibe ku bi xebata xwegor hevî û daxwaziyên gelên xwe pêk neanibit. Lê belê nizbetê hemû astengên navneteweyî û neteweyî jî xebata wê neyê berzekerin. Endamên PKDW'ê li ser sonda xwe ne. Di xebata xwe ya xwenûkirina bo sala 1998'an de, wê kêmasiyên xwe di ber çavan de derbas biket.



# Di helbest û stranên kurdî de *Lenîn*

S. BERBEYAN

**B**îrdoza sosyalîst ji mêj ve bala gelên bindest kişandiye û hêviyeke mezin daye wan. Bi taybetî piştî şoreşa Sovyetê ev bandor zêdetir bûye. Digel vê yekê pêşenga Şoreşa Kewçêrê Lenîn jî di dilê gelê bindest de cihekî taybet girtiye, pirtûkên li piraniya zimanên gelê cihanê hatine wergerandin. Di vî warî de ew serkêşiyê dike.

Lê divê bê gotin ku wan gelan bi awayekî tekûz bîrdoza Lenîn fêm nekiriye, ew li gorî xwe şirove kiriye. Dema mirov helwesta Maksîm Gorkî bîna bîra xwe, mirov dê bibîne ku gelê Rûsyayê jî ew bi awayekî tekûz fêm nekiriye. Lewre di gelek berhemên Gorkî de Lenîn wekî mirovekî efsanewî tê nasîn, heta li ser vê yekê helbestvanê tirk ê navdar Nazım Hikmet helbest nivîsandiyê û ew helwesta Gorkî rexne kiriye. Ji ber vê yekê tiştêkî surîştî ye ku gelên din jî Lenîn li gorî xwe şirove bikin.

Sazûmankarê Partiya Bolşevîk Vladîmîr Îlyîç Ulyanov Lenîn di 22'yê avrêla 1870'yî de hatiye ser rûyê cihanê, me divê li vir cihê Lenîn di helbest û stranên kurdî de bi çend mînakên nîşan bidin, bi vê yekê jî salroja ji dayikbûna wî ya 128'an pîroz bikin.

Ji bo ku mirov karibe bandora kesekî li ser gelekî binirxîne, divê mirov berê pêşîn li stranên binêre, lewre ew didin zanîn ku bandora wî kesî bi gelemperî li ser gelê heye, ne ku li ser çînekê an jî komek mirovên bijartî. Ji bo vê yekê di wêjeya kurdî de mînakên ku pêşî tê bîra mirov strana "Bîr nakim" e, ew stran rasterast li ser Lenîn e û bi taybetî berî cuntaya leşkerî ya 12'yê rezberê li ser zimanê gelek mirovên kurd bû. Vê stranê di pirtûka Mehmet Bayrak a bi navê "Kilam û stranên kurd" de jî cih girtiye. Ev stran bandora Lenîn bi awayekî zelal nîşan dide:

*Bîr nakim**Bîr nakim ha bîr nakim**Kirina Lenîn bîr nakim**Riya Lenîn wînda nakim**Bîr nakim ha bîr nakim**Sala hevdeh, hejdeh bîst**Me xeberek xweş bihîst**Derket navê sosyalîst*

Pêşenge Şoreşa Kewçêrê Lenîn, roja 25'ê gulana 1919'an li Qada Sor a Moskovayê digel hevalên xwe tê dîtin.

*Bîr nakim ha bîr nakim**Xeber hatiye seheran**Delîl hatiye seheran**Kurd ketine defteran**Bîr nakim ha bîr nakim**Lenîn hatiye welatan**Gel hatine civatan**Bo azadiya mîletan**Bîr nakim ha bîr nakim*

Di vê stranê de tiştê ku balê dikişîne, ev e ku dibêje "kurd ketine defteran", bi vê gotinê kesê ku stran nivîsiye xwestiye bide zanîn ku hebûna kurdan hate pejirandin û bi belgeyan hate selmandin, lê bi vê yekê qesta kîjan bûyerê tê kirin, ne diyar e. Xaleke balkêş jî tîkiliya di navbera Lenîn û azadiya mîletan de ye. Tê dîtin ku gelê kurd hatina Lenîn jî bo azadiya xwe wekî çareserî dîtiye, lê mixabin ev yek pêk nehatiye.

Dem a mirov çêlî helbestvaniya welatparêz û sosyalîst bike, ne gengaz ku helbestvanê mezin ê kurd Cîgerxwîn jî bîr bike, lewre di piraniya helbestên wî de bandora bîrdoza sosyalîst serdest e. Hinek helbestên Cîgerxwîn didin zanîn ku wî bi rastî bîr û ramana Lenîn baş fam kiriye û bîrdoza sosyalîst li gorî rewşa Kurdistanê şirove kiriye. Di hel-

besta bi navê "Îlham ji şairekî ermen" de wiha dibêje:

*Ev riya dirêj hinek kin kir, xweş bi çûna xwe**Li şûna esfîlt me ew rê raxist tev bi xûna xwe**Ev riya Markis, ev riya Lenîn me jî daye ser**Ey neslê hê bê, ji bo te me hişt çend şop û eser**Îlham dane me kuştina Qeyzer, kuştina Hêtlar**Bi zor em gihan rêza mîrên çê; pale û karker.**(...)*

Ev çend rêzên di helbesta "Heval Pol Robson" de xweş diyar dikin ku Cîgerxwîn, ne tenê ji bo ku bîrdoza Lenîn qala azadiya gelan dike, bi vê bîrdozê re ye, lê belê heta dawiyê bi wê bîrdozê re ye.

*(...)**Ey heval Robson**Fermo em herin**Serbest bigerin**Bixwînin, binêrin**Bibînin, bipirsin**Zorker nemaye ji kê bitirsin**Sînor nemane çi b'kin pasaport**Dilxweş û rûgeş keç û xort**Li vir xurînî bikin hingivîn**Li Mosko taştê, firavîn li Çîn**Li NîwYorkê şiv, li London paşiv**Çi reşik, çi spî tev bibin kiriv**Firek bidin xwe, em herin Merix**Destê xwe bidin Şêrîn û Zelîx**(...)*

Mînakeke din jî Reşîdê Kurd e, taybetiya wî ev e ku Reşîdê Kurd di nav çepgirên gelên serdest de cih girtiye ango wî di nav çepgirên Sûrî de cih girtiye. Di helbesta bi navê "Oktobir" de bîr û ramanên xwe li ser Lenîn wiha tîne zîmên:


*(...)**Lenîn nas kir, bîpartî**Ev gel bi rêbuharî**Azad nabe ji bin nîr**(...)**Ji nuh ve kir xebat**Saz kir partî û civat**Paşê bijart roj û dem**Da lîxîne şek û çem**Kês lê anî wî wek baz**Kire qîrîn bi awaz:**Haydê kar bin bajon pêş**Pale, rêncber, zehmetkêş! (...)*



18 avrêl 1992:

**Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê ava bû**

Instîtûya Kurdî ya Stenbolê ji layê hîn ronakbîrên kurd ve hate damezrandin. Hîmdar û avakarên Enstîtûyê ji van kesan pêk dihatin: Musa Anter, Yaşar Kaya, Feqe Hiseyn Sağnıç, İsmail Beşikçi, Abdurrahman Durre, İbrahim Gürbüz, Cemşîd Bender û Süleyman İnanoğlu. Cara yekem Musa Anter wekî Serokê İnstîtûyê hate hilbijartin. Ji destpêka sala 1998'an û vir ve Hasan Kaya serokatîya İnstîtûyê dike.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

22 avrêl 1898:

**Rojnameya "Kurdistan" li Qahîreyê hate weşandin**

Mîqdat Mîthed Bedirxan di sala 1898'an de cara yekemîn li paytexta Misrê Qahîreyê rojnameyeke kurdî bi navê "Kurdistan" derxist. Piştî vê rojnameyê di sala 1908'an de li Stenbolê ji layê Sureyya Bedirxan ve dîsa bi heman navê rojnameyek hate weşandin. Di sala 1919'an de jî Muhemed Mîhrî Hîlav li Stenbolê bi navê Kurdistan rojnameyek derxist.

**Li Ewrûpayê Bo Azadiya Welat Kampanya**

# Pêgeha Azadiya Welat Fireh Dibe

Ji ber bêrêkûpêkiya xwendevanên weşanên kurdî gelek asteng li ber firotin û belavkirina rojname û kovarên kurdî derdikevin. Ji dîroka weşangeriya kurdî heta vê gavê problema hanê gelek karên neteweyî û pîroz qels hiştine. Û li ber pêşketina ziman, weşangerî û rojnamegeriya kurdî bûye astengeke mezin ku em nikarin di warî de sersariyê bikin. Ligel bilindbûna têkoşîna neteweyî kêmbeşdarbûna bo kampanya û xebatên li ser weşanên kurdî jî rastiyeke me ye. Beramberî vê yekê gelek zanayên kurd ve kêmbeşdarî û lê

bo sed aboneyan hatiye destpêkirin. Ev kampanya heya roja 22'yê avrêlê, ku sedemîn salvegera Rojnameya Kurdistanê ye, didome. Ev sazî piştigiriya vê kampanyayê dikin; Yek-Kom, (Yekitiya Komelayên Kurd-Almanya), Karsaz, İnstîtûya Kurdî ya Berlînê, İnstîtûya Kurdî ya Stocholmê, YNK (Yekîtiya Nivîskarên Kurd), YMK (Yekîtiya Mamosteyên Kurdistanê), YHK (Yekîtiya Huqûqnasên Kurdistanê) û YRK (Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê), Mizgefta Ehmedê Xanî-Munchen, Komelaya Mezopotamyayê-Munchen.

Ji aliyê nûnerên rojnameya Azadiya Welat yê Ewrûpayê ve armanca vê kampanyayê wiha tê ravekirin: "Yekemîn, ev xebat ji bo 100 saliya rojnamegeriya kurdî xela-

tekê ye. Bi vê mebestê armanca me zêdekirina xwendevanên rojnameya Azadiya Welat e.

Her wiha armanca me ya duyemîn jî; gelek kurdên ku li Ewrûpayê dijîn nikarin xwe bigihînin rojnameyê. Navnîşana rojnameyê nizanin. Bi riya vê kampanyayê me hewl da xwe ku xwendevanên kurd, rojnameyê nas bikin û ji bo abonetiyê bibin xwedî derfet.

Belê, bi riya vê xebatê û xebatên ku wê dest pê bikin dê gelek xwendevan peyda bibin. Ev jî ji bo sedsaliya rojnamegeriya kurd ku bi gelek êş û janên xedar derbas bûye, xebateke girîng û pîroz e.

Kêm be jî rojnamegeriya kurdî, pêdivî bi van xebatan heye. Pêşengiya karên bi vî rengî jî ji bo pêşerojêke bi rûmet e. Destpêkirina vî karî karekî pîroz e û lazîm e her kes berpirsiyariya xwe bi cih bîne.

AZAD ALTUN

**ÇAVDÊRÎ**

Bila serê gelê me sax be!

SERKAN BRÛSK

Wekî tê zanîn Hefteya Qehremanî û Lehengiyê 21'ê adarê dest pê dibe û di 28'ê adarê de diqede, ku ev roj di heman demê de roja şehadeta Serkanê ARGK'ê Mahsum Kokmaz (Egîd) e. Bi munasebata bibîranîna roja salvegera şehîdbûna Egîd, li welêt û li derveyî welêt gelek civîn û şahiyên mezin hatin amadekirin. Bi hezaran kes tevî van civînan bûn. Wekî mînak îsal li paytexta Kurdistanê li avahiya HADEP'ê bi vê munasebetê civîneke mezin hatibû lidarxistin û gelê me jî ji bo fermandarê xwe bi bîr bîne, herikibû û şahiyê. Ev ji bo dost û dijminan daxuyaniyeke mezin b, berdeyam helwestgirtin bû, li dijî dijminê ku xwestibû Newroza li gel bike jehr. Gelê me bi pîrozkirina Newrozê û salvegera şehadeta Agît, di zik hev de du mesajên ji hev pir cuda dabûn: aşî û şer. Dîsa gelê me bi van pîrozbahiyên, banga bawerî seqakirinê li hemû endamên xwe kiribû û gotibû bila mirîna te hebe lê reva te tunebe. Ev dema ku ji hemû deman bêtir pêwîstiya me bi yekîtiyê hev girtinê heye, ev daxuyaniya gelê me ji bo hemû kesên welatparêz gelek tiştan diyar dike. Dema gelê me li Kurdistanê ev deng bilind kiribû, li Ewrûpayê jî gelê Kurdistanê azadixwaziya xwe bi awayekî bilind bo cîhanê ragihand. Newroz û Hefteya Lehengiyê hema bêje li hemû bajarên mezin yê Ewrûpayê hat pîrozkirin.

Li Stockholm û çend bajarên din ên Swêdê jî şahî hatin lidarxistin. Jixwe komelaya me ya Stocholmê ji mezçiyên (ziyaretkar) seranserê Hefteya Qehremaniyê vala nebûbû.

Belê, li komeleya me ya Stocholmê çûn û hatineke pir zêde hebû. Ji her aliyê Swêdê welatparêzan xwe li komelê girtibûn. Sedema hatina evqas welatparêzan xwedîderketina li hevala şehîd: Yıldız Düzgün (Hêlîn) bû. Dayik, bav û xwişka hevala Hêlînê seranserê Hefteya Qehremaniyê di meziya ku hevalan danibûn de rûniştin û pêşwaziya hemû mezçiyên yek bi yek kiribûn. Dîsa tiştê balkêş ew bû hemû saziyên me bi awayekî gelekî guncaw erkên xwe anibûn cih.

Gelo Hevala Hêlîn ku di vê biharê de ev germahî û çûnûhatina wisa mezin xistibû komeleya me kî ye û ji ku ye? Ez dixwazim bi çend hevokên ku me ji devê dê û bavê wê girtine, behsa jiyana hevala Hêlîn bikim. Hevala Hêlîn sala 1973'an li gundê Behwarê ku bi ser Midyadyê ve ye jî dayik dibe. Û sala 1985'an jî di diwazdeh saliya xwe de ligel malbata xwe diçe Swêdê. Êdî jiyana hevala Hêlîn ya li Ewrûpayê dest pê dibe. Piştî pênc salan Hevala Hêlîn li bajarê Upsala dest bi Lîseya Meslekî ya Hemsîretiyê dike. Lê ji ber ku daxwaza vegera welêt û tevlibûna refên şoresê her diçe di dilê wê de xurtir dibe, dev ji dibistanê berdide û sala 1993'yan bi awayekî profesyonel tevî refên şoresê dibe. Di nav salekê de xwe pir bi pêş dixwe û di dawîya sala 1994'an de jî xewna wê ya vegera welêt pêk tê. Êdî Hevala Hêlîn li Dibistana Navendî ya Partiyê ye û dixwaze bi xurtî ji tecrûbeyên Partiyê îstifade bike. Di vê dema perwerdebûnê de rastiya gelê me bi berfirehî fêr dibe. Bi taybetî jî pîrs û arîşeyên jina kurd bala wê bi xurtî dikşînin. Piştî demekê bi bîr û baweriyê xurt derbasî welêt dibe û heta roja li Çelêyê (Çukurca) şehîd dikeve ji bo azadiya gelê me û welêtê şer dike.

Piştî ku dayik û bavê hevala Şehîd û du hevalên din ku di nav şoresê de ne, gotinên xwe diqedînin û dibêjin: "Bila serê gelê me û Serokatîya me sax be!"

Em jî bi boneyî ve bîranîne hemû şehîdên Kurdistanê bi bîr û tîm û bêjna xwe li ber bîranînen wan ditewînin.

**Azadiya Welat****kampanyası sürüyor**

Bundan iki yıl önce 21 Ocak 1996 yılında İstanbul'da yayın hayatına başlayan Azadiya Welat gazetesi her sayısında Kürçe'nin Kurmanci lehçesinin yanısıra Kirdki (Dimili) ve Sorani lehçelerindeki yazılara da yer veriyor.

hwd. pêk bê. Mixabin ligel van gîlî û gazincan jî gaherîneke bingehîn pêk nayê û ev xemsariya li ser me xwendevanên her roj bi cihêrengiyeke cuda xwe dide xuyakirin. Wekî mînak li Tirkîyeyê jî bo Welat, Welatê Me û Azadiya Welat ji aliyê nivîskar û nûnerên wan ve gelek kampanya dabûn destpêkirin. Mixabin vê yekê xwe bi tenê bi gotinan sînor kir.

Lê di van demên dawî de tê gotin ku hewleke berfireh ji bo belavbûna zimanê kurdî tê dayin. Ev yek jî xwe li Ewrûpayê dide nîşan. Bêrî vêga bi şeş mehan di MED-TV'ê de reklama Azadiya Welat hate belavkirin niha jî tê belavkirin. Piştî wê rojnameya ku li biyanistanê li dûrî welat bi tirkî derdikeve Özgür Politikayê jî bi dayina îlana Azadiya Welat û kampanyayê jî bo abonekirin û belavkirina Azadiya Welat piştigiriya ve hewlê kir.

Dişa ji aliyê nûnerê Azadiya Welat yê Ewrûpayê Mahmut Gergerli ve kampanyayeke



# Piştî 100 salî, st

# 'Kurd

Piştî sed salî, çapemeniya kurdî jî "Kurdistan" êkê gihîştîye sedan. Îro jî hêlekê ve li welêt têkoşîneke çekdarî dimeşe, di cîhanê de jî bo wan berjewendiyên kurdan, xebatên diplomatîk tîm meşandin. Li hêla dim Karê pêşxistina çand û hunera neteweyî tî meşandin.

Diroka mirovahiye 22'ê avrêla 1898'an destnîşan dike. Miqdat Mihed Bedirxan bi hezaran kîlometre ji Kurdistanê dûr, bi navê "Kurdistan" li paytexta Misirê Qahîreyê rojnameyek derxist. Li Qahîreyê jî bi-li zimanê kurdî, bi zimanên din jî kovar û rojname derdiketin. Lewre salên navborî hest û ramanên kurdewarî û neteweperwerî berz û geş bûn. Li aliyê din desthilatdariya osmaniyan ku demekê mohra xwe li sê parzemînan dabû, li ber şikestin û têkçûnê bû.

Bêguman cara yekemîn, rojnameyek hem bi navê Kurdistan û hem jî bi giranî bi zimanê zikmakî derketibe û ev yek 100 sal berê qewimibe cihê şanazî û serbilindiyê ye. Ji ber vê şanazî û rûmeta hanê her sal li Kurdistanê (bi taybetî li Başûr) ev roj wekî "Roja Rojnamegeriya Kurdî" tî pîrozkirin.

Ji bo vê roja pîroz me rûpelên xwe ji ditin û ramanên sazî û rojnameyên kurd terxan kir.

### Dîroka MED-TV, Dîlêr Ahîngî:

Rojnageriya Kurdî wekî parçeyek ji doza gelê kurd, di qonaxên cur bi cur re derbas bûye, carinan geş bûye û carinan jî sist û hişk maye. Rojnamevaniya kurdî piştî pêvajoyeke dûr û dirêj, bi avakirina MED hat xemlandin, bi vî rengî, gaveke din a dirokî di cîhana rojnamevaniya Kurdî de hate avêtin.

Pêvajoya Rojnameya Kurdistan û televîzyona MED di hinek hêlan de dişibin hev in. Her du sazî wekî du saziyên neteweyî tîne nasîn. Bi avakirina her du saziyan, pêvajoyeke nû di diroka gelê kurd de dest pê kir. Rojnameya Kurdistan jî ber sedemên cur bi cur nikarîbû li ber xwe bide, lê MED-TV mîna çiyayên serbilind ên Kurdistanê serê xwe ji tu astengiyan re natewîne û roj bi roj karê û xebatên xwe geş-tir dike û her wiha serkêşiya rojnamevaniya kurdî dike.

Rojnameya Kurdistan peywira xwe ya nîştîmanî pêkanî û rê li ber cîhana rojnamevaniya kurdî vekir.

### Berpirsiyên Rojnameya Azadiya Welat (Rojna), Kurdî Mîdî:

Piştî sed salî, çapemeniya kurdî jî "Kurdistan" êkê gihîştîye sedan, lê gelo îro çiqas her rojnameyek an jî kovarek dikare bikeve xizmeta berjewendiyê têkoşîna rizgariya neteweyî? Ne bi sloganî, lê li ser bingeheke zanistî û hunerî!

Îro jî hêlekê ve li welêt têkoşîneke çekdarî di bin ramana serokatiya neteweyî de dimeşe. Li hêla dim dîsa bi rêveberiya serokatiya netewî, di cîhanê de jî bo wan berjewendiyên, xebatên diplomatîk û siyasî tîn meşandin. Karê pêşxistina çand û hunera neteweyî tî meşandin. Di vî alî de piştî sed


salên bihurî televîzyona neteweyî dest bi weşanê kiriye û bo ramana netewî xizmetê dike.

### Serokê Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê (YERK), Cahîl Mîmwan:

Serpêhatiya rojnamevanên kurd di dirokê de bêhempa ye. Ev serpêhatiya ku sedsal berê li sirgûnê, li Qahîre ye dest pê kir, îro li Kurdistanê û li deverên ku kurd lê dijîn bi xîretên bilind berdewam dike. Em

wan jî aliyê gelê kurd ve tî kirin û jî vî awirê ve jî qeder û pêseroya wan heta bi cihekî saxlemtir e. Temenê wan jî dirêjtir e, zêdetir digihêjin destên xwendevanan, baştir belav dibin û ne li cihekî, lê li gelek deveran tîne arşivkirin. Mîna duh ihtîmala windabûna wan jî, ne ew çendî mezin e.

Rast e, beşek jî dijwarî û astengên ku berê hebûn îro jî hene. Îro jî rojnameyên kurdî bi hêsanî û bêserêş dernakevin. Gelek jî wan ne li welêt, li derveyî welat in. Ji bo



Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê, wan rojnamevanên leheng bi bîr tînin. Ji ber vê yekê me di kongreya xwe ya sêyem de biryar girt ku sala 1998'an wekî sedsaliya rojnamegeriya Kurdistanê bê pîrozkirin. Di vê bernameyê de, di rêza yekemîn de em pêşangahêkê vedikin. Her wiha bi beşdariya hemû rojnameyên Kurdistanî panelek tî sazîkirin. Û her wiha jî bo xebatên wî, xelata sedsaliya rojnamegeriyê wê di şexsê Miqdat Bedirxan de jî bo malbata Bedirxaniyan bê dayîn.

Bernameya YRK wê di sala 1998'an de bi çalakîyên cur bi çur bidome. Em hewl didin ku jî bo pêşxistina çapemeniya Kurdistanî îsal konferanseke navneteweyî lidar bixin.


### Kavara Awagîn (Stûnêlêbim-SWED):

Rojnameyên me mîna berê ne girêdayî malbatekê, birayêkî an jî çend xizim û merivan in. Ji bo her weşan û çapemeniyê mirov nikaribe bibêje jî êdî piraniya rojnameyên kurdî ne bi peryên seferatxaneyên vî welatî û welatê din derdikevin. Fînança

yên li hundir sansûr berdewam e. Rojnamevanên kurd tîne kuştin, bi sedan cure kelem û xiram re li hemberî hev in. Heta kovar û rojnameyên kurdî derdikevin û digihêjin xwendevanên xwe, di nav zincîreke teşqele, nelibarî û pêşîrtengiyên re derbas dibin.

### Kavara Mîyanî Bawgan (Stûnêlêbim):

Miqdat Mîdhat Bedirxan, mûdaxelaya zimanê kurdan e, mûdaxelaya diroka Kurdistanê ye, mûdaxelaya mêjiyê kurdan e. Rojnameya Kurdistanê, niha jî bo me hem diroka me ye û hem jî ronahiya pêseroya me ye. Belkî di diroka gelên din de rojname tenê nûçe ye, agahdarî ye. Lê jî bo kurdan ziman e, dirok e, mêji ye û hebûna gelê kurd e. Divê rola rojnameya rola Kurdistan û rola Miqdat Bedirxan wiha bê zanîn. Tiştêk din jî ku Miqdat Mîdhat Bedirxan dibêje û em jî gelek girîng dibînin ev e: "Ez vê rojnameyê derdixim ku, kurd li ser rûdanên ku li dinyayê çêdibin agahdar bibin. Ji her hejmarekê du hezar heban, bêpere dişînim Kurdistanê ku gelê kurd fêrî zimanê xwe bibe, fêrî ilm û îrfanê bibe." Belê, Miqdat



### PORTREYA ROJ

**KURDISTAN**  
Destpêka weşanê: 22 avrêl 1898 pênçesê  
Cih: Qahîre, Cenevre, London, Folkstar  
Çap: Çapxaneya Cerîdeya Kurdistan-Qahîre/Çapxaneya Hindiye-Qahîre  
Hejmar: 31 hejmar weşiyane.  
Dem: Ji 22 avrêla 1898 heta 14'ê avrêla 1902'yan  
Mawe: Rojname du heftan careke belav bûye. Ev periyod wekî xwe nemaye, carîna mehê carekê û carinan jî çend mehate


Mîdhat Bedirxan, rojnameya Kurdistanê belkî çend hezar kîlometre li dûrî welat derdixe. Di vê pêvajoyê de kurd, divê bi taybetî li ser vê esasê bimeşin û layiqî Miqdat Bedirxan, Celadet Bedirxan, Musa Anter û Mazlum Doğanê ku di bin zilma herî mezin de, li Zîdana Amedê rojnameyek derxistîye, bibin. Divê kurd sala 1998'an bikin tac ji Miqdat Bedirxan re û rojnameyêke rojane ya xwerû bi kurdî bikaribin derxînin. Di rojnamegeriya kurdî de divê pêvajoya ser-



# Arka te geştir dibe

# Kurdistan

Kurd, divê bi taybetî li ser vî esasî bimeşîn û layiqê Miqdat Bedirxan, Celadet Bedirxan, Musa Anter û Mazlum Doğanê ku di bin zilma herî mezin de, li Zindana Amedê rojnameyek derxistiye, bibin. Divê 1998'an bikin tac ji Miqdat Bedirxan re.



guhê me de ye. Rojnameya Kurdistan di riya netewebûn, dewletbûn û xwenaskirinê de, ku her dem hatiye xwestin ku ji van yekan dûr bikeve, roleke girîng bi cih anîye û her wiha ji bûye bingeha rojnamegeriya kurdî.

Kurdistan, bi şewaz û metodên xwe ku tu car serî ji pest û kotekiyan re netewandiye, ji bo rojnamegeriya kurd a îro jî minakeke hêja ye. Taybetmendiyeke din jî ev e ku rojnameya Kurdistan jî wekî rojnamegeriya kurd a îro jiyana xwe li sirgûnê dido-

nan de bi cih dibe. Ji bo vê jî wext lazim e. Zimanên dinyayê yê pêşketî piştî dehsalan, sedsalan bi şixulandina ziman, bi esasên xwe, bi qayîdên xwe cihê xwe girtine û di nav xelkê de belav bûne. Îro bi zimanê tirkî, farisî, erebî hwd. rojname tên weşandin û cih didin pîrsa kurdî, lê zimanê wan kurdî nîn e. Bi awayekî din van weşanan kirasê xelkê li xwe kiriye.

Li gorî baweriya min lazim e mirov li ser van weşanan bisekine, ka gelo rojnaye-

xan dest bi weşanê xwe kir, di Kurdistanê de ji xeynî mele û feqiyan û çend lawên mîr û begên kurdan, kesekî xwende û nivîskar tunebû. Lê li hemberî vê yekê di serî rojnameyek ji bo kurdan pêwîst bû.

Ji wê rojê heta niha bi sedan rojname û kovar ji aliyê kurdan ve hatine derxistin û hê jî gelek rojname û kovarên kurdan di her warên cihanê de weşana xwe didomînin. Ji vê yekê jî êşkere dixuye ku, bingehê rojnamegeriya kurdî heyê û ev bingeh pêwîstiya xwe, ji rola çapemeniyê digre.

Bêguman li ser rojnamegeriya kurdî gelek tiştên din jî tînin gotin û nivîsin. Di serî de jî bedela vê xebata bi rûmet, hewceyê pesnê ye. Çimkî vê xebatê, vê berxwedanê, heta îro bedelê mezin da. Bi dehan rojnamegerên kurd di vî warî de şehîd ketiye. Apê Musayê 70 salî, di vî warî de bedela herî pîr bû. Lê hevalên wekî Mehmet Saîd Erten, Çetin Abayay û Ferhat Tepe jî, hê di bihara jiyana xwe de ji bo pêşketina rojnamegeriya kurdî, ji bo azadiya welatê xwe şehîd ketin. Her wisa bi dehan kurd di vî riya pîroz de hatin birîndar kirin, ketin zindanan, ji axa bav û bapîran dûr ketin, bûn mi-hacir.

*Serokê Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê û Berpirsê Kowana Zandê, Hûsûn Kuyû:*



Dîmenek ji protestoya li dijî bombekirina Özgür Ülkeyê

mand. Miqdat Bedirxan bi xêza weşana rojnameyê diyar kiriye û helwesteke hêja daye xwe ku rojname girîngiyê bide zimanê kurdî.

Di pêvajoya îro de li Tirkiyeyê Ûlkede Gündem û li sirgûnê (Ewrûpa) em wekî rojnameya Özgür Politika, di weşana xwe ya rojane de, bi mebesta ku em riya "Kurdistan" bişopînin û xwe wekî dengê gelên bindest dibînin û bi vê gelekî serbilind in. Lê dil dixwest ku tevahiya kurdan bi zimanê xwe weşana xwe bikira. Ev mijar ji bo pêşxistina rojnamegeriya kurd û her wiha ji bo tevahiya saziyên neteweyî divê ji bo salên pêş bibe armanca bingehîn.

Bersiva me ya herî watedar li sedsaliya xwe de ji bo Kurdistanê ev e ku em ji îro bêhtir xwe bi karê xwe ve girêbidin, temsîla Kurdistanê azad ku li ser lingên xwe sekiniye, pêk bînin.

*Xwende û Berpirsê Kowana Nîstûmanê Nîstûman, Sîlîyûman Çemik:*

Wekî ku tîte zanîn ziman bi şixulandina di kitêb, rojname, kovar, radyo û televîzyo-

mek yan jî kovarek bi temamî bi zimanê biyanî derkeve û xitabî kurdan bike jî ew weşan di nav rojnamegeriya kurdî de tîte qebûlîrin yan na?

Em mijar gelek caran hatiye munaqeshe kirin. Bi baweriya min mirov bi hêsanî nikare wan di nav rojnamegeriya kurdî de qebûl bike. Lewre xwedî û xwendevanên wan kurd bin jî zimanê wan kurdî nîn e û ji zimanê biyanî re xizmetê dikin. Hundirê wan kurd be jî derê wan kurdî nîn e. Kesên bo zimanê xwe re xizmetê nekin, bo zimanê biyanî re xizmetê bikin mirov wê wan di ku derê de qebûl bike? Bi ya min divê rojnamegeriya kurdî beriya her tiştî xwe ji vê sosretiyê xelas bike. Yanê kurd divê vege- rin ser zimanê xwe û bi zimanê xwe rojnamegeriya xwe bikin.

*Çavkaniyê Çiyê ya Rojnameya Nîstû, Fêlîm ÎPK:*

Bêguman çapemenî û hecatên din ên ragihandinê, di hemû cihanê de çekên herî girîng in. Ev çeka girîng, bû sed sal ku ji aliyê kurdan ve jî tî bîkaranîn. Dema ku "Kurdistan"ê bi serperîştîya Miqdat Midhat Bedir-

Rojnameger mîna muhendîsên civakê ne. Êş û kemasiyên civakê berî her kesî bala rojnamevanan dîkşînin. Rojnamevan neynikê datîne ber civakê. Gel ji xwe di wê neynikê de dibîne. Em dikarin bibêjin, civaka ku ne xwediyê çapemeniyêke bi rêk û pêk be, mîna dareke rizî ye.

Ji ber van sedeman ji hemû gelan behtir, pêwîstiya kurdan bi çapemeniyêke bi rêk û pêk heye. Ji ber ku kurd neteweyêke bindest bû, nebûye xwediyê çapemeniyêke pêşketî. Lê wekî gelek tiştan piştî tevgera azadiyê, di warê çapemeniyê jî pêşveçûn çêbûn. Tevî hemû astengî û zordariyên li ser çapemeniya ku ji rojnameyên mîna Halk Gerçeği, Yeni Ülke, Özgür Gündem, Welat, Welatê Me, Azadiya Welat û îro jî Ûlkede Gündemê pêk tînin, di warê çapemeniya kurdî de, şoreşek pêk anîye. Xebatkarên van rojnameyan gelek berdêl dane. Em rêz û hezkirina xwe pêşkêşî şehîdên van rojnameyan dikin. Ew di dîroka çapemeniya cihanê de ciheke girîng bigrin.

Ji bo pîrozbahiya 100 saliya rojnamegeriya kurdî ye, li ser navê Enstîtûya Kurdî me bang li hemû kovar û rojnameyên kurdan kir. Bi vê mebestê, gelek civîn hatin lidar xistin. Gelek kesên lêkolîner û nivîskar dê beşdarî van çalakiyan bibin. Agahdariyên der barê kovar û rojnameyên kurdan Bakur de û teblihên vexwendiyên dê wekî pirtûk bêne çapkirin.


SALIHÊ KEVIRBIRÎ

**MEYAYA KURDISTANÊ**  
carekê derketiye.  
Form: Rojname ji 4 rûpelan pêk hatiye.  
Alfabe: Alfabe ya kevî angî tîpên erebî hatiye bikaranîn.  
Ziman: Kurdî û osmanî lê giranî bi kurdî.  
Pêşvekirîna rojnameyê: Miqdat Mîthed Bedirxan ji hejmara 1 heta 5'an.  
Evdîrehman Bedirxan, ji hejmara 6'an heta 31'ê.

dema Özgür Gündemê bi taybetî were nixandî.  
**Rojnameya Özgür Politika (Baza Kurdî Nîstûman):**  
Di sedsaliya xwe de em bi te re ne "Kurdistan"  
"Kurdistan" qêrîna yekemîn a kurdan e li sirgûnê. Her çiqas sed salên xwe dagirti- be jî ew deng û qêrîna bêhempa hê jî di



# Şevnameyek bo Helîm Yûsiv!



Ehmed Huseynî

mêra ku ji deh salan û vir de di çerxa bêhû-deyiyê de bêser û şûn dizizike, îşev jî, wek wê babelîska Newala Zerayê ya ku me xwe davêt kezeba wê, hilperike asoyên bîranînê û guliyên vê taristana spî, geh bi ava qiriktaliyê û geh jî bi şehên giryanê, dihûne.

Lê şeva me, şeva ku tiliyên giyanê me bi hîneya mirinê dipêça û serîhildana kulîkên Girê Mozan ji ber çavê pinpinîkên zaroktiya me vedîşart, ew şev, a niha, wek kiras û xestane dayika min, wek dara hinarê ya ku ji bagerê hez nedikir; di daristana bêrikirinê de winda dibe.

Em ji hev tîr nebûn!

Hûn li wî rexî! li oqyanosa tozê, tolik û perparê hînî rehdaçikandinê dikan û gula hîroyê jî

ber bi xilmaşî û sergêjahiya 'Komara dînan' ve radikîşînin!

Em jî li vî rexî bêrex, gir û car û qelaçên xwe hînî rondikên berfê û sîbera darbestan dikan!

Û ji nişkê ve, zuhayî konê xwe yê bêstûn di dilê me de vedigre. Hespên birîndar ên bahoza birîndar guh nadin termên xewnê û li ser lêvên wî Torosê evînkuj; bi hezaran êvar vedimirin, heyveron dişikin û berbang diçilmisin.

Lê gula berbero ya ku ji pey xwîna me venagere, ya ku di şaneyên demê de, wek agîrê Sînemeya Amûdê ber bi tenhatiya sirûdên hebûna me ve sernîşîv dibe, ew gul; Helî-moo!! Wek xetîreya karwaneke şevlêgeryayî, gur dibe, bêcir dibe, har dibe û xwe çeng dîke da ku beşdarî govenda şîngiriyê bibe. Lê dîsa jî, toza ku vê şevê bi ser pencereya bîranînê de hildîweşîya û xwe davête pêxêra îkoneya xatîrxwestinê, tozeke zêrîn, dîlovan û giranbuhâ bû. Toza ber lingê rêving û koçeran bû, angû ahenga veçirayî ya hec-hecîkên destê Melekê şehîd û Ciwanê ku di çesnê gula qedîfe de bû, şermok û lezokî bû, toza dengbêjên nivtemen û stranên qurmiçî û xewn û xwezayên beravêti bû.

Gulwazeke bêhnçîkyayî bû; ji sînor û mayînan direviya û li ser eniya Girê Şermolayê, wek reşebayekî bînav, vedilîst û hetava rûreş û çarenûsa rûreş, bi bêhna mirinê di-sûşt.

Em diwestiyan, lê toza demsalan her û her geş dibû.

Em dimirin, lê tavesorkên ji tozê, li ser kêlên me yên ji mermira nenas, dilîlandin û çûkan jî navên me ji bîra dayikên me dibirin.

Çûk mirin... Nîveroj mirin... Hêlan mirin...

Û çemê Amûdê jî mir.

Heval mirin... pencereyên kesk mirin...

Bexçe û cejn û qûm û teşîrêş jî mirin.

Helîm!

Nivê şevê ye, yan jî hinekî derengtir e, wek ku çawan Kafkayê xemgîn pasvaniya şevê dikir, wisa wek Dawidê Medîna pasvaniya sînorên êş û bêrikirinê dikim. Di çeper û delkeyên kurterojên Helebê de bi nav dibim. Li wî xaniyê ku di dûmana tûtînê de direqisî, Çek û Çiya li hevdu mikûr dîhatin û Çarçira mîna çirayên kolanên bajarên me yên xwelîrengî, di şevistana xwîna me de vediket, li wir, li ber bêhna dîroka rîzyayî û li bin perên şikestî yên lehengên xewna çîyan û çemên mezin û bêkevî, me peyvên xwe bi dîlokan perwerde dikirin û me pênuşên xwe di çavê Xwedê de re dikirin.

Di vê şeva şevgerîn de, te bajarê xwe û efsaneya welatekî bêzîman; bi sêr kûrekûra rûpelan de avêtin û te berê xwe da tînazîya hebûnê da ku berkanîyên te bîranîn bin... da ku îstgehên te, wek rehên bişîrînê, bêrêwî û bixçîk û bêjîn bin.

Helîm!

Em ji hev tîr nebûn!

Em ji ewrên tozê tîr nebûn!


Lê dîsa jî, dê şev, gula berbero, çemê zuha û tîpên latînî di babelîskê de hînî axînen me bibin û dê li ser rêçên seferê çavên xewnê ji destên xatîrxwestinê biparêzin û dê bajarên ji jêhrê, wek çavşînkên, bi eniya me ve daliqînin.

Lê qe nebe em bêriya toza bindest a xewna bindest dikan...

Qe nebe, vê şevê, te bi kêra dengê xwe, birîna kevnare ya axa bêrikirinê ji nû ve vekir.



Ji Damezirînerên Koma Amed şehîd Melîk (Sêx Melî, Ebûbekir)



Helîm Yûsiv



Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 18 avrêl 1998 şemî:

Konser: Koma Agirê Jiyân saet:14:00

Şano: Ji NÇM'ya Edeneyê "Teatra Yekbûn" bi navê "Agirê Gel" derdikeve pêşberf hunerhezan. Saet:17:30

● 19 avrêl 1998 yekşem:

Konser: Koma Azad saet:14:00

Şano: Teatra Yekbûn: Agirê Gel saet:17:30

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM İzmir

● Pêşengeha Wêneyan: Bi nêrîna zarokan û bi zimanê wêneyan jiyân saet:10:00

Konser: Koma Rewşen (NÇM- Edene) saet:18:00

● 19 avrêl 1998 yekşem: Bi navê "Çiyayê Bêzar" ji Koma Rewşen konser e. Seansa yekem: saet:15:00 Seansa Duyem: saet:18:00

● 22 avrêl 1998 çarşem: Özgür Kürsü Mijar: Têkiliyên jin û mêran Beşdar: D. Şahîn- Z. Değirmenci saet:17:00

● 24 avrêl 1998 în: Konferans: Komkujîya Ermenîyan, saet: 18:00

# PKDW'ê 3. salvegera damezrîna xwe pîroz kir



Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat roja 12'ê avrêlê sêyemîn salvegera damezrîna xwe, li navenda PKDW'ê ya li Brukselê, bi beşdariya gelek kesên navdar, parlamenter, diplomat, burokrat, rojnameger, nivîskar û nûnerên dewletên biyanî pîroz kir.

PKDW sala di 1995'an de li bajarê Lahey bi ser Hollandayê hate damezrandin. PKDW'ê di navbera van her sê salan de gelek karên pîroz bi cih anîn. Di warê dîplomasiyê de ji Moskovayê heta Washingtonê, ji Swêdê heta Afrikaya Başûr têkiliyên bingehîn danîn û gelek encamên baş ji van têkiliyan wergirtin. Bi gelek parlamentoyên dewletên biyanî re têkiliyên fermî hatine danîn. Heyetên beramberî hev û komîsyonên hevalbendiyê pêk hatine. Ji damezrîna PKDW'ê heya vê gavê têkiliyên kurdan ên diplomatîk, ku bêpergal bûn, bi riya xebatên PKDW'ê yê diplomatîk sererast bûn.

Li aliyê din PKDW'ê ji bo rawestandina şerê li başûrê Kurdistanê jî gelek xebat pêk anîn. Ji bo vê yekê ev du sal in ku komîsyonek li Başûr xebatên xwe didomîne. PKDW'ê di dîroka dîplomasiyê ya Kurdistanê de barê herî girîng û giran hilgirtiyê. Li gel van yekan gelek caran problemên bürokratik û diplomatîk ji derketin peşiya wan. Di sala 1996'an de dema ku dewlata Belçikayê bi ser MED TV'ê de girt, di heman demê de bi ser PKDW'ê de jî girt û helwesta xwe ya li ser kurdan bi vê

êrişxa xwe da der.

Her wiha endamên PKDW'ê bi zimanê kurdî li parlamentoyên wekî Yewnenistanê û Rûsyayê jî dîtî û daxwazên xwe anîn zimên. Bi vê nêzîkedayîna PKDW'ê dewleta tirk gelekî zivêr bûbû û di mansetên rojnameyên xwe yê rengîn de bi awayekî tund helwesta xwe ya tûj li dijî vê nêzîkedayîna Yewnenistanê nîşan dabû.


Di pirozbahiyê de Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya digel nêrîna xwe yê giştî û der barê kêşeya kurd de wiha axivî: "Em çi dixwazin? Em çareseriyê çawa dixwazin? Bi tevkujî û bi çekan çareseriyê kêşeya kurd pêk nayê. Ev yek ji aliyê serokên tirkan ve jî tê pejirandin. Riyeye tenê li ber me dimîne, ew jî çareseriyê siyasî ye. Her du aliyên şer divê bi riya danûstandina li ser bingeha wekhevîya gelan û çareseriyê federatîf li hev rûnin. PKDW'ê jî ji bo ku fedarasyon bo dilê her du gelan e, ji roja roj de alîgiriya vê yekê kiriye."

Her wiha di pirozbahiyê de Serokê Konseya Rêveber Zübeyir Aydar jî kurteaxaftinek kir. Aydar di axaftina xwe de li ser dîplomasiyê û karûbarên ku bi riya PKDW'ê hatine kirin û danûstandinên ku bi dewletên biyanî pêk hatine û li ser aştiya di navbera kurdan de sekinî. Wî daxuyand ku, parlamentoyê jî bo aştiya di navbera kurdan de gelek xebat kirine û niha jî ji bo kongreya neteweyî xebatên gelekî berfirêh dike.

A. WELAT/ BRUKSEL

## TÎŞK

### Cengê Psîkolojî



KAZIM TEMURLENK

Dîrê heşt ra raver rojnamanê tirkan zure henenî eşî wertê ke ma hergu jî caver da pesewe peroz zuranê tirkan sero vindet me. Qesey kerdene serokê PKK de jî eke zalal nêbî, henî werte de verda, mi vake, demake werte partiye de taye meseleyî estê. Hurenayîs hergu dayîm esto, hama nafa ters xof kut zere mi. Xora ez nê, eke şiyoyê kotî wija raste perso biyo. Owo ke dost o jî, owo ke mara dîrî yo jî kutbî bine teşîre ne propaganda. Hama peyo eke sermiyananê PKK vejîyay televîzyonê MED de qesey kerd, hergu welat heskerdax bî şa.

Cengê psîkolojîk mordem nika dayîna ret fam keno. Însan ceng ke vajiya çeko ano verê çimê xo. Îndî aqil û îzan vindeno, gonî, merdey, hurînda pagonê rijayîyo hergu çî îfadê keno. Ceng ke vajiya dest de çekî eskerî yenê fikrê mordemî. Hama hete binî zaf nêne mordem vîrî. Kam ceng vezeno, çaye, çitur vezene. Cengî çitur îdare kenê. Ceng de tewre zaf çî muhîm o. Yiyê ke ebe çeko wertê ceng de re, çik a ke qederê cengî belîkere çî, heto bînde mileto ke be çeko xizmeto cengî keno, yî jî cengî sero wayîrê de role gird ê. Moral û tîvare mîlet ke ceng re nêmend, o ceng keno vînd. Îşte dewleta tirkî tewre zêde na het sero vindeno. Ebe seran ê ke dewleta tirkî verva xelesâ kirmanco cengo de qîlêrin ramena. Vejiya werte ke çekî tek teyna tawaye nêbeno sere. No çîqa ke hurdmîna heto rê niya vejîyo werte jî tewre zaf dewlet re niyaw.

Dewlete raver ke şîye gerîlawo ser vake di hîrê terorîst ê Hama serî verd ra niyada ke qe henî karê di hîrê terorîstan niyo. Nafa ver çarna cengê psîkolojîk. Gerîlawî kerdî parçeyî, tankan ra girêdayî wertê sukan de herd ra xiz kerdî. Goşî pîrnîkî cira kerdî. Meyîtî ebe dozaran kerdî binê wele. Henî kerdene ke ebe ters û xof sere mîlet kuye. No bes nêbî, mîlet qir kerd eşî gerîlawo ser. Werte bono de domanî vesnay ebe asmo vetî televîzyanan. Neçe rey îfrakraf vetî vake PKK qediya. Neçe rey ebe zuro sermiyane PKK kiştî.

Nika hona cengê psîkolojîk devam keno. Hem jî zederên, giraniya cengî nika kuta vile psîkolojî. Di qiwetî ame te verver, kes nişkîno keşî bizero binê hukme xo. Hete eskerî ra rewş niyaw. Dewlete naye de zor da cenge psîkolojî. Zuranê heneno kena ke bi xo bile înam bena. Îşte sermiyane PKK remay, ne zanon PKK biye letey. Eke xora hete PKK r acab nediya, raver mi çitur ke vake, bixoyê bile înam bena.

Hama nafa herhalde serba kirmanco guriye. Çîqa ke raver mîlet kutra tewerte jî, peydo vejîya werte ke zuro husk holo. Na zur ra dima înam ne kon ke reyna mîletê ma qesa dewleta tirk re înam bikero. Îndî naye ra dima halê dewleta tirkî bî hale şane zureke rî. Çitur ke şane zurekerî vato verg kuto werte malî keşî înam nêkerdo, naye ra dima dewleta raşt jî vazero îndî kes cirê bawer nêkeno.



# Mirovên ehmeq

**H**ebû tunebû, zilamekî pir xizan, bêkes û bêwar hebû. Di nav xizaniyê de jiyana xwe derbas dikir. Cil û libasên wî gelek qetayî û peritî bûn. Tenê telîsekî wî hebû. Telîsê xwe diavêt ser milê xwe û diçû li gundan parsekî dikir. Qirş û qalên ku didan hev, dixist telîs û dianî mala xwe. Xwarina wî her dem nanê hişk û zêytûna reş bû. Carina zêytûna reş jî bi destê wî nediket. Lê belê ev mirovê xizan ji hal û demê xwe kêfxweş bû. Her roj limêja xwe dikir. Dema nanê xwe dixwar, dia û daxwaza xwe ji Xwedê re dikir û digot:

—Ya Xwedê hezar şikir ji te re, min îro jî nanê xwe xwar û zikê xwe têr kir.

Lê rojekê ev zilam dîsa dihere limêjê û wiha gazî Xwedê dike:

—Ya Xwedê çi ye ev halê min! Ev xizani, pêxwasî, tazîti çi ye? Ma gelo ev qedere? Ma qey her dem birçîbûnî ji me re hatiye? Ma qey ev heqê me ye? Hema rojê jî dewlemend bûma, ma dinya naqulube? Ya Xwedê, ez jî evdê (kûl) te me. Van xwestekên min qebûl bike.

Ew di ber xwe de dibêje:

—Xwedêyo! Tu li jor nav ezmanê şîn de xuyayî. Tu li evdê xwe dinihêrî. Gelek xemgînî hene, tu yê ji evdê xwe re bibêjî.

Xwedê jê re dibêje:

—Ya evdê min, rabe ser xwe! Bide ser riya xwe, ez ê heqê te bidim.

Zilamê pêxwas kêfxweş dibe. Mênzera xwe ber hev dike û bi ser riya xwe de diçe. Diçe û her diçe, çol û çiya, rê û deşt, derb û dûz diçe. Çem û rûbaran li pey xwe dihêle. Lê derekê goleke mezin dibîne. Tê qeraxa golê, lê dinihêre ku di nav golê de masî xuya dikin. Zikê masiyan tijî zîv û zêr e. Zilam li wan temaşe dike. Lê belê masî dîsa jî tevî dewlemendiya xwe hawar û qêrîn dikin. Hawar û nalîna wan gûhê zilam dizingand. Zilam diheyire û dibêje:

—Birayên masî, hûn çima ew qas hawar dikin. Hûn dewlemend in, lê dîsa jî hûn hawar dikin. Çi ye sedema vê yekê?

Masî dibêjin:

—Birayê rêwî! Em masî hemû



nexweş in. Zikê me hemûyan diêşe. Em nikarin xwarinê bixwin. A îcar tu hatî, gotineke me ji te re heye. De ka li me guhdar bike:

Şûjin û kêra te heye. Ji te re zehmet nebe tu me emeliyat bike, ev zêr û zîvên ku di zikê me de ne derîne. Bila hemû jî, ji te re bin. Tu yê bi van zêr û zîvan gelek dewlemend bibî. Her wiha em ê ji vê êşe xilas bibin.

Zilam serê xwe xwar dike û dibêje:

—Na, ez biçim li ser riya xwe. Heqê min Xwedê dide min. Vê gotina we ez qebûl nakim.

Çiqas masiyan gazî û lavatî kirin jî, zilam bêdeng ma, boxça xwe avêt ser milê xwe û da ser riya xwe. Çû her çû, li çem û giran derbas bû. Li deverê şîn rast hat. Her der dar û ber bûn. Di nava şahiyê de kulîlk, hehecik, pîrîrok û teyr difirîn, qewz didan xwe. Ew dever di nav daristaneke geş û mezin de bû. Di nav bajarê vê deverê de qesireke mezin hebû. Zilamê xizan deriyê qesrê vedike, dinihêre di hundir de jinek digirî. Meraq dike û ber bi jinikê ve dimeşe. Dibêje wê:

—Xwişka delal, tu çima digirî. Çi li te qewimiye? Derdê te çi ye?

Jinik lê vedigerîne:

—Ez ne xwişka te me. Ez qralî-ça vî welatî me, zilamê min miriye. Gelê me rabû ser piyan, serî hilda. Lê belê her kês şaş maye, di cihê xwe de disekine. Ji bo me û welatê me qralek pêwîst e. Ez ê ji te re tiştêkî bêjim. Tu qiral be, ez jî jina te. Ev hem ji bo me, hem jî ji bo gelê me gelekî baş e. Em ê gelek dewlemend bibin. Jixwe em dewlemend in. Tu çi dibêjî:

—Na, na. Ez li tiştên ku hazir in nagerim. Ez tiştê ku evd didin nagirim. Ez ketime ser riya Xwedê. Heqê min çi ye wê Xwedê bide min.

Dîsa dikeve rê û diçe. Di rê de li gurekî rast tê. Gur gelekî xemgîn, bi derd û keser xuya dike. Hem birçî ye, hem jî gurî ye. Pûrtê wî hemû weşiyaye. Zilam bo gur dibêje:

—Kekê gur! Ev çi halê te ye! Çi li te qewimiye? Min mereq kir. Ji kerema xwe re derdê xwe ji min re bêje.

Gur lê vedigerîne:

—Mamê min, ez nexweş im. Kal im, birçî me, gurî bûme. Tu kar ji dest min naye. Ez nema dikarim sewalan bigirim. Zurbeya min jî ber vê yekê ez qewirandim, min qebûl nake. Dermanek heye, lê belê ez nizanî wî dermanî çawa peyda bikim. Hekîmên guran dibêjin, mirovek bêaqil bibîne, mejiyê wî bixwe, tu yê baş bibî.

Gur dest bi girî dike û dibêje:

Halê min ev e. Tu li van çiyayê rip û rût çi digirî?

Mêrê xizan wiha bersiv dide:

Mamê gur, ez li risqê xwe digerrim. Ez ketime ser riya Xwedê. Da ku Xwedê heqê min bide. Gurê pîr difikire. Di ber xwe de dibêje:

—Yaw vî mirovî zêr û zîv, tav û text û dîtin. Lê dîsa li wan nebû xwedî. Xwedê da devê wî, lê wî nexwar. Weleh heye, tune ye, ev mirov ehmeq e.

Gur yekcar radibe ser xwe, hildipeke û mirovê pêxwas û xizan dukuje. Mejiyê wî derdixê û dixwe. Bi vî rengî gur baş dibe. Mirovê ehmeq jî, berdêla ehmeqiya xwe bi canê xwe dide. Çîroka ma ji ehmeqan re ders e, nezanî û biaqilî li ser wan ne ferz e.

Jl GIRTÎGEHA BARTINÊ



# Kovara Avaşîn derket: Hejmareke têr neteweyî

Her çiqas ev demeke dirêj e ku li ser ronakbîrî û pîvanên ronakbîrîyê, di kovar û rojnameyên kurdî de gotûbêj û nirxandinên dûvedirêj tîn kirin jî, ev mijar hîna jî nivîskar û xwendevanên kurdî ditamijîne. Di hejmarê heftemîn a Avaşînê de jî mijara sereke ronakbîrî, pîvanên ronakbîrîyê ne.

Di kovarê de, nivîsên ku der barê ronakbîrîyê de hatine nivîsandin, bi hev dijîtiya xwe balê dikişînin. M. Ali Tüysüz bi sernavê "Sed Kes Tunne" nivîsê ku jê reşbînî difûre, darêjtiye. Bi baweriya Tüysüz, ronakbîrên kurd hem kêman, hem jî qels in. Nivîskar reşbînîya xwe bi van hevokan tîne zimên: "Hîn hezar kes nikare bi zimanê xwe bixwîne û binivîse. Sed kesên me yên di warekî şarezayî nîn in... Ev çi perîşanî ye! Ev çi bêçareti û belengazî ye!"

Diyar e, nivîskar, bi taybetî di warê xwendevanên weşanên kurdî de bi tîra xwe ne agahdar e. Her wiha bes li gorî rewşa Bakur fikiriye, ev jî nişaneya sînorên psîkolojîk e. Li aliyê din îro li bakurê welêt, ne bo dil be jî, gelek xwendevanên weşanên kurdî peyda bûne. A girîngtir pêwîst e, mirov hinekî li raboriya xwe temaşe bike. Bo nimûne berpirsiyarekî kovareke kurdî li ser vî mijarê wiha gotibû: "Berî vî 5 salan me jî bo ku pirtûkeke kurdî redakte bike, kes nedidit. Lê îro bi sedan kes peyda bûne." Her çiqas Ali Tüysüz di nivîsa xwe de behsa "potansiyeleke veşartî" jî dike,

aliyên nivîsê yên reşbîn gelekî berbiçav in. Tüysüz di nivîsa xwe de, li gel kategoriyan civaka kurd, bi şeweyekî hûr û kûr li ser raborî û rewşa îro ya ronakbîrên rawestiyaye.

Li layê din Zinarê Xamo di nivîsa xwe ya bi sernavê "Rewşenbîrên kurd he ne û ji kesî jî ne kêmtir in" de, li dijî dîtînan kesên wekî Ali Tüysüz derdikeve. Bi dîtîna Xamo, kurd he y r a n ê xelkê ne û xwe biçûk dibînin.

Di s a H a y d a r. Diljen jî di nivîsa xwe ya bi sernavê "Roşnîr ya zî Entellektuel û Entellektueley" de qala hebûna ronakbîrên kurd dike. Bi boçûna Diljen bi sedan û hezaran ronakbîrên kurd peyda bûne. Nivîskar, di nav hêmanên ronakbîrîyê

de cihêkî sereke dide zimên û vî dîtîna xwe wiha rave dike: "Nezanîna zimên, sewiyeya ronakbîrîyê nizm dike. Kes

nikare bo kesekî/e ku kurdî baş nizane, bi-bêje ronakbîrê kurdan e."

M i h e m H i m b ê j j j i di nivîsa xwe ya bi s e r n a v ê "Roşnîr o yo ki s e m e d ê T ê k o ş i n a Netewa kurd pênûsa xwî n e x e b i t n o s u c d a r o" bi ş e w e y e k î tund rexne li hindê ron a k b î r ê n kurd ku Ew r u p a y ê d i j i n, girtine.

Ev hejmarê Avaşînê bi

nivîskarên cihêdîtin balê dikişîne. Ev yek kovarê bêhtir serkeftî û neteweyî dike. Her wiha cihdana hemû zarawayên kurdî jî vî yekê geştir dike. Berpirsiyarên kovarê di pêşeka kovarê de, çêli

van yekan dikin û didin xuyakirin ku, deriyê wan bo hemû dîtînan vekirî ye.

Di s a b e r p i r s i y a r ê n k o v a r ê h ê v î d a r î û b i x w e b a w e r b û n a x w e t i n i n z i m ê n û r a d i g i h i n i n k u k o v a r e k e d e m s a l î t ê r n a k e, ew dikin ku kovarê bi awayekî din biweşînin.

Li aliyê din, diviyabû ev hejmar li ser sedemên salvegara rojnamegeriya kurdî bihata amadekirin. Ev jî kêmasiyeke berbiçav e.


Di kovarê de nivîsa Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan, ku li ser Osman Sebrî nivîsiye balê dikişîne.

Nivîsa Murat Ciwan a bi sernavê "Şerefname Pencereya kurdan a li ber mîjûyê" û nivîsa Celal Akyürek "Jiyana kurdên Enedolê Navîn" bi aliyê xwe yê lêkolînî hêja ne.

Ji bilî van, ev nivîs, di vî hejmarê de berbiçav dibin: Li Rojhilata Navîn Terrora Dewletê-İ.Beşikçi, Xelata Nobel, Pêjnên Siyasî û Îdeolojîk-Mîrhem Yiğit, Şewazî Nûsîn le nûsînî Nûseranî kurd de-Alan Rubar, Kongreya Nete-weyî Zû ye an?-Salih Kevirbirî, Folklo-ra Kurdan-Awêneya Jiyana Wan e. B. Malava, Biwêjên Kurdî-A. Tigris.


Di vî hejmarê de helbestên, Zeynel Abidin, Jiyana Alpîranî, Xerzanê Xerzî, Kawa Nemir, Ferîd Han, S. Berbang, S.S Dilpolo, Birîndar û Yekzan hatine weşandin. Her wiha kurteçîrokên Hesên Metê, Xurşîd Mîrzengî û August Strindberg di vî hejmarê de cih girtine.

MAZLUM DOĞAN



## Apê Tewfîq an Mêrxasekî Bêdeng

OSMAN ÖZÇELİK



Gel bi lîxwedîderketina hêjahiyên xwe dibê netewe. Hêjahiyên gelekî, yên herî giranbuha jî mirovên wî gelê ne. Welat jî, netewe jî bi mirovan heye û hêja dibê.

Di ev rojan de me mirovekî xwe yê hêja wînda kir. Di 81 saliya xwe de Apê Tewfîq, Tewfîq Sîncar çû rehmetê. Di vî quncikê teng de, ez dixwazim bi kurtayî qala vî mêrxasê me yî dilbîrêhm, dilpak û nefsbîçûk bikim.

Mîrê Cîzîra Botan, dişîne pey axeyê Omeriyan ku wî biezimîne. Mîr, li dûv yekîtiya kurdan e. Axayê Omeriyan vî vexwendinê (dawet) qebûl dike û bi mirov û zilamên xwe yên bijarte ve berê hespên xwe yên şê didin Cîzîra Botan. Mêvantî bî diyarî nabe. Dên û kûpên kevnare bi dimsa Omeriyan (ya mîna zêr meqbûl) dagirtî li ser piştê deve û qantîran tîn edilandin. Mîr, mazûbantiyeke qenc û rûmeteke mezin pêşkêşî axa û zilamên wî dike. Axayê Omeriyan kurê xwe yî biçûk ku navê wî Mehemed e jî bi xwe re bedlek (taximek) şal û şapik dide dirûtin û lê dike. Mêvantî

diqede, axayê Omeriyan bi dilekî şad vedigere navêl û şerîsa xwe. Gava Mehemed bi şal û şapika xwe li nav gundê Omeriyan digere, gel navekî nû li wî dikin: "Mehemedê Cizîrî."

Mehemedê Cizîrî bavê Husênê axaye. Husên bavê Elî axa û kalikê Tewfîq Sîncar e.

Kurekî din yê Mehemedê Cizîrî jî, Eshed e. Eshed bavê Osman, Osman bavê Şerîf, Şerîf jî bavê Îzedîn e.

Îzedîn axa gava sala çûyî çû rehmetê sed salî bû. Îzedîn axa bi qasî bîst salî di nav refên peşmergeyên Mele Mistefa Berzanî de pêşmergetî kiribû.

Îzedîn axa, bavê nivîskarê kurd, Şerefxan Cizîrî ye, ku li Swêdê dijî û serokê belediyeke Stokholmê ye.

Xwişka wî jî Cîhan Sîncar e. Cîhan jina şehîd Mehemed Sîncar e. Endamê Rêveberiya Navendî ya HADEP'ê û bûka apê xwe Tewfîq Sîncar e.

Apê Tewfîq, jî bav û kalan de axayê Omeriyan bû. Belê ew bi dûv mal û milkê dinyayê neket. Ji wî re hebûna herî hêja hezkirina însanan bû. Dikarî xîzmet ji zarokan re bikira. Perîsîn a wî (îbadet) hezkirin û xîzmet bû. Serê xwe jî ber neyaran netewand, şerê û heysiyeta xwe di her mercî de parast.

Roja gundiyan wî çekên dewletê hilgirtin û bûn ceşş. Kurê wî Şukrî (Remzî) li ser çiyayê welatê xwe, di nav refên gerîla de şerê azadiyê dikir. Gava ceşşan ajotin ser gundine

welatparêz ku gund vala bikin, kurê wî yê din, Fethî (Kamûran) bûbû serbazê yekîneyeke gerîla. Û gava Şukrî li gundê Daşîk û Fethî li Sêrtê di nava hefteyekê de, li pey hev şehîd ketin; Apê Tewfîq, hêsirên çavên xwe nekir dilol û di ser rûyê xwe de nebarand ku kêfa dijmin li me neyê. Wî xwe fêrî bi kela dilê xwe fûrandina hêsirên kiribû.

Dema kurê wî yê mezin Mehemed bû parlamenter û li dû doza gelê xwe meşiya, apê Tewfîq girtin birin îşkenceyê. Digotin bila Mehemed neyê welêt, bila li Enqereyê li kêfa xwe binêre. Wekî her car apê Tewfîq bi sebra Gandî û bi bêdengî ya xwe neyar serpiştî li erdê dixist.

Roja Mehemed li Batmanê qetilkiribûn, telefonêk jî wî re hatibû. Digotin: "Nebêje qey kurê min hat kuştin û ez xalas bûm. Hêj felaketên mezin li pêşîya te ne!..."

Dewletê cenazê Mehemed nedabû gelê wî û partiya wî (DEP). Wan dixwest malbata wî bî merasim cenaze veşêrin. Tîrsa wan di cih de bû. Bi sedhezaran kes wê beşdarî xwepêşandanê bibûna. Cîhan Xanim û Apê Tewfîq, herduyan jî gotibûn: "Hheke hûn cenaze teslimî gel nekin, me jî navê. Ew şehîdê gelê xwe ye!..."

Dewletê cenaze revand û bi dizî veşart.

Apê Tewfîq cenazê kurê xwe yê seyemîn jî nedîtibû. Belê ew di sîa negirî û kêfa neyaran li me neanî.

Me rêberekî xwe, mirovekî xwe yî hêja wînda kir. Hezar li rehmê gora wî.



# Tahar û Nefîstan

## Kuçik û kevîrên girêdayî

**T**ahar rojekê bo jina xwe Nefîstanê dibêje: "Qîzê! Ez ê va ye herim bajêr. Tu li ber deriyê malê me be û li derî miqate be."

Piştî vê tembîhê, Tahar ji bona pêwîstiyên mala dihere bajêr û li nav bajêr doş (digere) dibe. Lê dinêre ku Nefîstanê jî mal li pey xwe hiştiye, li nav bajêr ji xwe re digere.

Tahar diçe balê û jê re dibêje:

- Qîzê Nefîstan! Ma min ji te re negot li ber derî be!

Nefîstan bersivê dide û dibêje:

- Ê va ye derî li piştî min e, kes nikare derî bibe!

### Gayê sor

Welat, dê û bavê wî di malekê de dijîn. Bavê Welat û diya wî tim di nav rez û xerzîkê xwe de dixebitin lê belê Welat tim heta nîvro di xew de dimîne û li kêfa xwe dinihêre. Rojekê bavê Welat sibehê zû hişyar dibe û li ber guhê wî qala zewacê dike:

- Lawîkê min were alî me bike, em ê zaxê xwe biçinin, erdê xwe cot bikin, gayê sor bifroşin û em dê te bizewicînin.

Welat piştî van gotinan êdî her tim sibehê zû şiyar dibe, di nav xerzîk û rez de dixebite. Benê xerzîka lê dike û neqebê xerab jî sererast dike. Lê belê lê dinihêre bavê wî, dil nîn e ku wî bizewicîne. Radibe dihere hinda (cem) diya xwe û bi şermokî ji diya xwe re dibêje:

- Yadê, ka we ew gayê sor çer kir!



Xalê Eşo zilamekî feqîr e. Ew xwe dide ber her karî lê belê têra debara (îdara) xwe pereyan qezenc nake.

Rojekê li gundekî karek derdikeve. Gerek e here wî gundî, lê wê rojê jî baranê pir daye, pey wê re bahoz hatiye. Bager (bayêkar) hatiye nav gund, gund tev de cemed (qeşa) girtiye. Xalê Eşo diçe nav gund. Gundî ji ber ku gelek sewalan (heywan) xwedî dikin, serê her malê kuçikekî xwedî dikin.

Xalê Eşo wexta dihere nav gund, kuçik bi hewte hewt ber bi vî diçin. Dike ku rahêje kevirêkî lê belê kevîr qeşa girtiye, hil nabe. Xalê Eşo dibehice (diteqî le). Tu hêviya wî namîne û heta ku jê tê di ser gundiyan re diqîre:

- Haho lawo hûn çî gundi ne! Hûn hem kuçikê xwe ber didine mirov û hem jî kevîrê xwe girê didin!

FÎKRET NALÇÎXANÎ

## BI XELAT...

## XAÇEPIRSA BI XELAT (116)

## XAÇEPIRSA

B	A	Z	A	N	S	I	T	L
B	A	Y	G	E	L	D	I	I
T	E	R	I	K	A	Z	G	J
T	N	I	Y	E	M	A	N	
P	V	A	T	I	L	E		
D	E	V	E	R	A	R		
V	A	T	A	V	I			
H	I	R	O	J	A	K		

PEYVA VEŞARÎ → (P)A(N)E(B)E(R)Z

### Bersiva Xaçepirsa 114'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin.

Xelata hejmarê me ya 116'an kasete Şivan Perwer a bi navê "Xewna min" e.


#### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.




Pênc kesên ku xelata hejmarê 114'an kasete Kazo 'Gola Wanê' qezenc kirine: Zelal Demir/Edene, Nesrin Toprak/Osmaniye, Baran Adıgüzel/ Kırıkkale, Jiyan Sımsız/ Sêrt, Özgür zafer/ Amed

Dadyane Rewsênbir ê di wênê de	Mam Bi soranî 'edî'	Hucra Kanê	Niqte Fikir	Qanûnî Hê	Dendarên 'not'
1					
Bêav (Berepaşki)		Dahûrîner		2	
Zanyar		Begê began			
	7	Cinavkek Xeşimî		Qertafa neyinî Bi kirdkî 'navber'	Agir
Veşewtin			Bi farisî 'av' .... û ber	9	Cinavkek Tîpa berî 'H'
Qertafekê tewangê		Rexnekar Ajalekî avê			
		5			
Cinavkek Dawera - florê		Binêre (heremkî) Pêrkitek		Dawera azotê Lê belê	
6	Çiyayê Agirî Beyreq	8		10	
Hêsan			Gelo		
Dinî			Dawera karbonê		
		4			
		Evcar	3		



PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10





**WELAT**  
Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Çarşemgêr  
Gundemê Hefteyê  
Yayînçîk  
Ran: Tel: 0212 331 522 23  
Xwedî (Sahibî)  
SELAHA TÎN DELÎ  
Yançîn Yêrî  
Çarşemgêrêk  
Seydîyêk  
No: 11/8  
Tel: 0212 331 522 23  
FAX: 0212 331 522 23

ÇARŞEMGÊR  
Yançîn Yêrî  
Çarşemgêrêk  
Seydîyêk  
No: 11/8  
Tel: 0212 331 522 23  
FAX: 0212 331 522 23

BÛROYA ÎRTİBAZÊ  
(REDAKSYON)  
Ayarêk  
No: 11/8  
Tel: 0212 331 522 23  
FAX: 0212 331 522 23

Çarşemgêr  
Yançîn Yêrî  
Çarşemgêrêk  
Seydîyêk  
No: 11/8  
Tel: 0212 331 522 23  
FAX: 0212 331 522 23

Çarşemgêr  
Yançîn Yêrî  
Çarşemgêrêk  
Seydîyêk  
No: 11/8  
Tel: 0212 331 522 23  
FAX: 0212 331 522 23

# Şarê kurd xapeynayin nê azadî wazenê

Nê rojanê peyinan de Partiya Fazîletê, tepişê hetanî CHP, pêrin verê xo açarnawo şaristananê bakurê Kurdistanî û iyê şarê kurd ra ray wazenê. Iyê vanê qayê şarê kurd kerden û zûrên înan xo vîra kerdê. Nezdîyê weçînî de bakurê Kurdistanî ra nêvejyênê, tim û tim estin û rastîna şarê kurd anê zîwan, badê weçîniya estin û rastîna kurdan xo vîra kenê û pey-ra vejyênê kurdan ra ray wazenê.

Ek şimayê zey verî zûrî nêkenê, ewro firsendo zaf gird kewto şima dest. Serokê PKK Abdullah Öcalanî heftewo verîn qandê raya diyalogî akerdin, ser-daranê dewleta tirk rê mektûb riştê. Ek şimayê wazenê şer biqediyê serdaranê dewleta xo îkna bikirê.



Deniz Baykal

Nê partiyan ra êkê ewro balê mardimî ancenê Partiya Fazîlet û CHP wa. Hefte wo verîn serokê Partiya Fazîlet û serokê DTP şî Ruha û wija zaf zaf ha-

qanê şarê ma sero qisey kerdî. Serokê Partiya Fazîlet wija ra ravêrd Amed û wija jî zaf zaf haqanê ma sero xeylê çî ardî zîwan. Amed de zey Ruha nêşa rast ra rast ray biwazo, coka vat, kamîn partiye qandê şima karê rindî kenê raya xo bidê înan û zey nînan xeylê vînanî ardê zîwan.

ser hukumat mebo jî, bena partiya Tirkiye wa en gird. Coka na partî verê xo kerdê hetê şarê kurda û vana şarê kurd rê zilm û zordariyo beno. Zek yeno zanayin komisyonê cenîyanê CHP 21 menga reşemî de konreyê cenîyan Sêrt de virastîbî û wija serokê na partî Deniz Baykalî vatîbî dewlet tiya en zaf cenîyan rê zilm û zordarî kerdê, ezo nameyê Tirkiye ser şima ra ravêrîna xo wazena (özür diliyorum). Ancî goreyê dazanayina komisyonê xortanê CHP iyê 9'ê menga gulani de ebi slogana mehmedî jî mehmetçîgî jî mekişyêya Dêrsim de panel virazê û rojê ravey qediyayina şerî biwazê. Nê panelî peyra jî tewrbiyîne Deniz Baykalî ya wija mîtingo viraziyo. Deniz Baykal o Dêrsim de nêrindîna şerî sero vindiro.

**MÎJDAN**  
Çimê şima roşnî bê!  
Kamê ke wazenê ziwane xo bimûsê, serva înan Înstîtuya Kurdî de 2'yê gulane de qurs bena ra (abiyeno).

Ca: Înstîtuya Kurdî ya Stenbol  
Atatürk Bulvarı Ceylan Palas  
Apt. No: 154/12  
Aksaray/İstanbul  
Tel: 527 19 11

Zek yeno zanayin, nê çend heftanê peyinan da partiya ke haqanê kurdan sero qisey kena û vînanînanê xo ana zîwan CHP wa. Her hefte jû heyet rêşena bakurê Kurdistanî û vaten ke ca de bo, zaf zaf zûrî çekena û wazena şarê kurd ra zey verî ray bigiro. Kes ke dîroka na partî heveyê aşaneno, ewneno hemû qetlîaman de giştê na partî esta. Ronayîne Tirkiye ra hetanî nika, biyarê xo vîrî seranê 1991 peyra na partî Tansu Çillera piya çiçi niyard ke şarê kurd ser. Dewê ma, mardimana piya veşnay êkê nêveşnay jî kerdî vengî (talî). Hezarana kurdî welatê xo ra vîstî dîrî, kerdî muhtacê leteyê nanî. Ewro ewnê ek destegê şarê kurd bigiro xo pey xo-

ro firsendo zaf gird kewto şima, partiyanê bînan û komalanê demokratane Tirkiye dest. Serokê PKK Abdullah Öcalanî heftewo verîn qandê şerî qedînanî û raya diyalogî akerdin serdaranê dewleta tirk rê mektûb riştî û vînanîne xo ardî zîwan. Ek şimayê wazenê şer biqediyê serdaranê dewleta xo îkna bikirê bes o. Dêrsim de panel û mîting virastina şer nêqediyeno. Xora ek şimayê fina zey verî wazenê şarê kurd bixapeynê, qe xo hetanî Dêrsim mebetilnê (meqefilnê) û peranê xo jî rayanê bakurê Kurdistanî de meheremnê. Çimki ewro şarê kurdo şima û partiye ke zey şima yê pêrin rind silasneno.



ÜLKEDE

# Ji Gündemê

## Manshetên qedexekirî

Rêlibergirtinên li ser **Ülkede Gündemê** dom dikin. Wekî me di destpêkê de gotibû, ji bo protestokirina rêlibergirtin û zordariyên li ser **Ülkede Gündemê** ku ketina wê ya **OHALê** hatiye qedexekirin, em di vê rûpelê de manshetên çend rojan bi kurdî diweşînin

12 avrêl 1998 yekşem:

### ÖCALAN BEHSA NAMEYA BO DEWLETÊ KIR

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, naveroka nameya ku ji rêveberên Komara Tirkîyeyê re şandibû, eşkere kir. Öcalan got ku, nameya ku li ser daxwaza raya giştî û 'tikaya derdorên dost' ji ber taybetiya pêvajoyê deng vedaye. Hin rayedaran û medyaya tirk ji bo nameyê gotibûn: 'Dîsa tengav bû, li pey textikên nû ye.' Öcalan ev gotin, wekî nirxandinên erzan nirxandin û di-

1- Em perçebûna Tirkîyeyê li gorî armancên xwe yê polîtîk guncaw nabînin. Eleqeya vê yekê bi hêza me re tune ye.

2- Mesele, ne pelîşandina dewletê ye, ji nû ve avakirin e. Ev yek tê wateya reformeke bingehîn di hundirê dewletê de.

3- Divê piştî vê radeyê, bo domandina şer zêde nayê israrkirin. Şerên hundirîn bi lihevkişandinê diqede.

4- Terza çeteyan mirov kuştin e û eleqeya wan bi lehengî û şervantiyê re tune ye. Heke em şer bikin jî, bila li go-

Tirkîyeyê jî gelek cureyên bihevrebûnê pêk bînin."

13 avrêl 1998 duşem:

### TC LEZ DA PLANÊ XWE YÊ BO AVAKIRINA DEWLETA TIRKMANAN

Nûnerîtiya PKK'ê ya Başûrê Kurdistanê diyar kir ku, Tirkîye bi armanca tirkmenkirina Başûrê Kurdistanê îradeya kurdan, asûriyan û dewletên din ên herêmê bi tiştêkî nahesibîne û her roj gaveke nû diavêje. Di daxuyaniya der-

welatparêz û şoreşger bi hev re tevbigirin. Li aliyê din ji bo PDK'ê jî bang hate kirin û wiha hate gotin: "Ji niha ve rayeya we ya li Hewlêrê ji dest we çûye. Di dawiyê de hûn dê têkevin rengê 'tirkên çiyayî'."

### 'KONSEPTA 92'YAN KOMPLO YE'

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, konseptê 1992'yan komployeke hêzên biyanî nixand. Li gorî Öcalan, konseptê navborî bi civîna 28'ê rêşemîya 1997'an dest bi guhartinê kiriyê û got, şerpe hincet e.

Abdullah Öcalan di axaftina xwe ya MED-TV de got, Koma Güreş-Çiller ev plan pêkanîn û ev pratîk xwe di xerakirina gundan, cinayetên fail nediyar û taswîyeyên di hundurê dewletê de dide der. Dîsa Öcalan got 'Tiştên bi konseptê 92'yan hatiye xwastin bi ihtimaleke mezin ji aliyê hin derdorên leşkerî ve hatiye fêmkirin."

Öcalan di axaftina xwe de diyar kir ku PKK bêhêz nebûye, qewimînên dawîn, dîtineke dîrokî rast derdixê û ev qewimînê ve yekê hedef dikin. Öcalan wiha berdewam kir: "Tiştê ku zorê dide min, girtina biryara; gelo ez şer gur bikim an na ye. Çimkî hêza me ya gurkirina şer, niha ji her demê pirtir e."

16 avrêl 1998 pêncşem:

Ji ERNK'ê ji bo propagandayan bersiv:

### EV ÎDIDA ZEÎFBÛNA DEWLETÊ NÎŞAN DİDİN

Rêxistina ERNK'ê ya Ewropayê propagandayên piştî operasyona Şemdin Sakik nixand. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Ev tişt serdanpê tiştêkî ku dewlet bo berjewendiyên bi kar bîne ye. Di vê pêvajoyê de tiştê ku divê bê nîqaşkirin; asta gerilayan ku bi rêberiya serokatiya PKK'ê bi dest xistiye" ye.

Di daxuyaniyê de li ser şerê psikolojîk ê dewletê ku li dijî kurdan dimeşîne wiha hate gotin: "Ev şerê psikolojîk ku bingeha wê derew in, ne ji ber qelsbûna me ye; Jixwe tu gotinên dewleta tirk ku ji gelê kurd re bibêje û tu hinceta wê ku ji raya giştî ya cihanê re pêşkêş bike nemane."



yar kir ku ji vê tewra wan diyar dibe ku 'name girtine'. Öcalan wiha berdewam kir: "Ew nikarin rasterast bibêjin me name girtiye. Mixabin ev yek bo Tirkîyeyê rewşeke nebaş e." Öcalan got ku, pêwîst e bûyera nameyê bêhtir bê me-zinkirin û wisa got: "Ya girîngtir wekî perçeyekî ji van qewimînan, ka wê konsept kengî têkeve rojeva raya giştî. Çimkî rojên germ dest pê kirine."

### XALÊN KU DI NAMEYÊ DE CÎH GIRTINE:

rî rêpivanên şer be.

### 'ŞARISTANÎ BI SER KET'

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan her wiha şerê li bakurê Îrlanda-yê jî nixand û ev lihevhatina siyasî wekî gaveke dîrokî destnîşan kir û got "şaristanî bi ser ket." Öcalan da zanîn ku Îngilistan ligel pir bihêzbûna xwe, qet negot; "Ma IRA kî ye, çend sed anarşîst in" û li gorî vê nêzîktêdayînê tevnegeriyaye. Öcalan di dirêjiya axaftina xwe de wisa axivî: "Em dikarin ji bo

heqê ve mijarê de wiha hate gotin: "Amadehiyên bo îlankirina dewleta tirkmenan xilas bûne." Hate diyarkirin ku planên navborî wê bibin sedema dijminatîya gelên herêmê ji bo tirkmenan. Bi vê yekê ve girêdayî hate gotin ku 'Ev plan ne li gorî berjewendiyên tirkmenan e.' Dîsa hate diyarkirin ku armanc bidestxistina nefta Musul-Kerkûkê ye ku bixin xizmeta çinên serdest.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku ev plan perçeyek ji 'plana mêtîngehkirina' PKK'ê ye û pêwîst e hemû hêzên